**Omitê Mistefê**

# Dîwana Eşq û Meşqê

# (2021-2023)

**Naverok**

**1. Ji bo salvegera dîlketina dilazadekê**
**2. Devê xwe bi xêrê veke**
**3. Bi xwendinê raweste**
**4. Tenê ne “kî” me ez**
**5. Awirbayê, dê hesabê tenêmayîna min ji te bipirsin!**
**6. Par û kar û yar**
**7. Bi evînê dihûnim guliyên te yên sênexî**
**8. Gerdena xwe veke**
**9. Ma te bi Quranê sond xwariye**
**10. Sirgûnê rastiyekê**
**11. Ez ê îşev bigirîm ji kenan**
**12. Tê bîra te Pîroze?**
**13. Hişyar be ji xewa bêxîretîyê**
**14. Dibêjin**
**15. Erê, hê li vir im**
**16. Par vî çaxî derketibûm Bazîda Jorîn**
**17. Îro Newroz e li dilê min ê agirdadayî**
**18. Ditirsim**
**19. Bibexşîne, êdî nikarim!**
**20. Çend şîretên sofiyê qiyametê**
**21. “Hilbijêre” ji Nizar Qebanî**
**22. Sê bîranîn**
**23. Dilo, hilo; êdî bes e!**
**24. Evîneke bêsînor, ji Nizar Qebanî**
**25. De bila derê**
**26. Ez evîndariyê dizanim, lê belê... ji Ehmed Meter**
**27. Çend helbest ji Dr. Zekiye Malullah**
**28. Her Xwedê dizane**
**29. Bi xatirê te Xibşê**
**30. Hevpeyvîneke kurt bi Araratê re**
**31. Li ber wêneyê Dilmestê**
**32. Îşev were xewna min**
**33. Berfa ku dibarî li bîranînan**
**34. Dema ku helbesta te dixwînim**
**35. Bi helbesta zikmakî min vejîne û rojane bike!**
**36. Îro yekşem e, ez hûr û xaşe me**
**37. Hawar ji destê xwedagirkirinê!**
**38. Hey dewranê, tu herî û qe venegerî!**
**39. Hînbûn pêvajoya rêwîtiyekê ye**
**40. Şeva îşevîn çito dem û dewran e gidî!**
**41. Keko, tu dizanî xem çi ye!**
**42. Roj qefilî şeva bêdengiyê**
**43. Heft pêlikên evînê**
**44. Çar helbestên hilawistî li jûra Gulnîgarê**
**45. Sedeqeyên helbestkî berî serdana Sîsilê**
**46. De were, sipasiya Dilrûbarê neke!**
**47. Roja hevdîtina Qemerê, miçiqî kaniya kederê**
**48. Helbesta heşt saetên vajîkirî ji xewê**
**49. Li ser şopa Aryayê**
**50. Trajedyaya îlahî**
**51. Bi xatirê te Bazîda rengîn heta vegereke din**

**1. Ji bo salvegera dîlketina dilazadekê**
*-ji bo mamosteya zimanê kurdî Zara Mihemedî-*

Îro tu hatî bîra kurdan Zarayê!
Ziman û keda te hatin rojevê!

Bizanibe ku êdî tu li bîra me ya tarî çira yî;
bîra qederê tu wekî ûsivekî nîşanî me dayî!

Lewre kenekî ûsivî li ser lêvên te ye;
pûşiya kurdî li dora gerdena te ye!

Welatê te bi sebreke ye’qûbî,
li benda wê rojê ye ku azad bî!

Bawer ke, roniya çavên te çirûskek vedaye;
lê neteweya te ji wê çirûskê vînek hildaye.

*21.02.2021*
*Bazîd*

**2. Devê xwe bi xêrê veke**
Pa û pesn ji bo xwedawendê gerdûnan;
Ew xwedawendê nîgar kirîye awayê hebûnan,
Ew mihriban û bexşendeyê bendeyan,
Xwedîyê roja qiyametê,
Rûgehê kar û niyetan.

Dizanim, nifir dengê bêkes û belengazan e;
du û dirozge jî çeka hişmendan e
ji bo berxwedaneke demdirêj.
Lewra çendîn caran tevî refên belengazan bûm
bi tengezarî û nifrînan;
çendîn caran bi dua û dirozgeyan
beşdarî civata hişmendan bûm.
Lê belê piştî salên çilî,
himehima mirinê daliqî ber katara stûyê min
û ez bêhtir masîkî noqî zeryaya jiyanê bûm.

Nizanim, li qatê çendan ê binê behrê bû
ku dengekî zengilkî ji guhê min spîltax derbas bû:
*“Wey bêkeso, belengazo, rebeno!*
*Sincaqên mirinê kuta nabin*
*Rojekê dilê te yê bibijine kurmikekî, kêzikekî an jî nanikekî;*
*tu dê bêyî vegera yar û dostan*
*ji nişkê ve hilperkî çarenûsa xwe ya kirasguhertinê.*
*Giyanê te yê vekişe bal xwedîyê xwe,*
*û termê te yê bimîne ji kêz, mar û mûran ra.”*
Min ji wî dengî ra got:
*“Devê xwe bi xêrê veke;*
*rêyeka vegerê nîşan ke,*

*bi lewheyan ji şaşîtîyan hişyar ke*
*û beriya fatiheyan fethekê miyaser ke.”*

Nizanim dengê min ew deng birî,
yan dengê min pê ra berwar firî.
Ji wê gavê û pê va
ew deng kêlindiyeke pey serê min ê similkî ye
û ev bersiva min jî destûra jiyana min e:
*“Yan hiş be, yan jî devê xwe bi xêrê veke.”*

*08.05.2021; 22:36*
*Bazîd*

**3. Bi xwendinê raweste**
Mirovo!
Tu pirtûkeka hêja yî,
bi xwendina “xwe” raweste;
cendekê xwe movik bi movik bixwîne
û piştra ber bi cîhana xwe ya derûnî
hiş û dilê xwe daxîne.

Destpêkê tu kulmek ax bûyî,
bi baranekê hatî vilçiqandin
û di qalibekî da hatî rokirin.
Xwedê pifî cendekê te kir
û ruh hate ber.
Lewra şîreta min li te:
navê Xwedê neperitîne
ji bo kar û kiryarên nerewa.

Tu pifek ji ruhê Xwedê yî
Xû û xisletên te
di navbera milyaketên ronî
û cinên tarî da ne;
lê belê qalibekî te heye:
li ber çavan xwîn, goşt û hestî yî.

Binêre, Xwedê çiqasî comerd e
ku ji ruhê Xwe pifî te kirîye;
ji ber xwarina mêweyê darê
dê û bavê te ji bihuştê qewartine
û bi qelemeka darînî
rûmeta te bilind kirîye.

Mirovo! Bi xwendinê raweste,
bi xwendina “xwe” pirtûkê raweste!

*25.05.2021; 15:51*
*Bûrsa*

**4. Tenê ne “kî” me ez**
“Kî” cînavkeka pirsiyariyê ye;

dibe ku “min” û “te” yan jî “wî” û “wê”yê nîşan bide,
û dibe ku “me” û “we” yan jî “wan”ê rave bike.
Lewra “kî” ne tenê “ez” im.

Ji dema zaroktiyê dizanim ku dihate gotin:
*“Ez ez im, destmala gul-gevez im, dixwim ez im, naxwim ez im.”*
Lê bawer bikî, ev jî dîsa ne “ez” im
û ber bi gotineke pêşiyan dibezim:
*“Çivîk çivîk e jî, avê vedixwe û bi ser xwe re li Xwedê dinêre.”*

*25.05.2021; 16:23*
*Bûrsa*

**5. Awirbayê, dê hesabê tenêmayîna min ji te bipirsin!**
Ev demeke dirêj e,
ne diaxivim ne jî dixwînim;
lê amadehîya nivîsekê dikim,
wekî amadehîya dawîn a sofîyekî
ku her kêlîyekê qiyamet dihesibîne.

Berî baraneke gumrah,
min awirên te yên tund û tûj dîtin Awirbayê!
Di wî quncikê tarî da nizanim çi wext bû;
lê baş dizanim ku demeke piştî helbestê bû,
biryara min ew biryara te bû
ku bi lekmekî rustemî
dev û diranên wehşetê hûr û xaşe bikim
û di ber siya kerxane yan jî lotikxaneyekê da
bêhna bihuştê hilnekim.
Lê belê ez tenê bûm
û ditirsîyam ku hesabê tenêmayîna min ji te bipirsin;
ji ber ku navê dildarîya min bi ser te ketibû
û nûçeyeke pesna te ji devê min şehitîbû.

Bawer bike,
ev ne gotineke qalebal e
yan jî hesteka ji bestan e,
ne xewnerojkeka telexewîyê ye
ne jî cizbeyeka ayîna bihuştîyan e;
dê hesabê tenêmayîna min ji te bipirsin.
dê ji temenê bextewarîya te bikurtisin
tifa min a li rûyê dîrokê,
xewnên min ên beravêtî
û hêvîyên min ên kavîjî.

*15.05.2021; 17:19*
*Bazîd*

**6. Par û kar û yar**
**a. Para min ji wê talanê**
Dema ku em ji wê talanê vegerîyan,
baş e ku tu para min ketî Şahmarê.

Bi xatirê xatirceman,
ji tirsa jan û satirceman,
ez ê ji te ra selikekê bihûnim
ji cîl û qamîşê sazê Noreşînê
û devikekî bidim serbanê.
Madem ne ku qewas,
lê qewad nikarin têkevin jûra keybanûyekê,
tu bi ewlehîyeke bêqusûr veleze li nava wê selikê
û ez ê bi meqameke taybet te hişyar bikim.

Ji ber ku ez û tu
şênîyên aranê ne Şahmarê,
lêvên min wekî meyeke kartî
û tu wekî mareka dêm a tî
li benda hişyarbûna wan î.
Îcar ferqeka sereke heye:
Laşê min li aranê be jî,
xeyalên min digihêjin ewran
û dibezin çîya û zozanan;
heçî ku bi xewnan e
dewsek namîne ku lê negerin.
Lê min bihîstîye ku mar
li ser avê û di xewê da
bi çu zindîyî venadin;
lewra tu bi zimanê xwe yê zilfiqarkî
binê pêyên min dadialêsî.

**b. Karê min li vê cîhanê**
Ez bilûrvanê maran im;
neh tilîyên min li ser qulikên bilûrekê rêz bûne
û yekê xwe givaştîye xeyalekê.
Li pêşberî min
şahmareka devjev a zimançeqel
deftereke mûsîqayî ye
û 41 rûpelên windabûyî yên temenekî,
li wê perestgeha dawîn a lalbûnê
mînanî nota û newayên senfonîyekê
melisîne ser kaxezekê.
Pifa min a fenanî sûra Îsrafîl jî
jîyanekê ji xewa dawîn radike.

Nizanim,
gelo dengê bilûra min digihêje Lalişê?
Gelo krîza mîran qedîyaye
û micêrkan bi kirîvan ra peyman girêdaye?
Gelo çendê koçekan xwenda ye
û teksta Mishefa Reş aşkera ye?
Nizanim.

Wekî ku min got, karê min ev e:
ez bilûrvanê maran im,
haya min ji dengên dîtir nîn e;

min xeweka xweş hildaye,
bi zikekî têr rehek ji sûsa Warê Ûsikê Qelender cûtîye
û tasek ji ava Kanîya Qiçîyê bi ser da vexwarîye.
Her wiha min bi benîştekî qanikê çengeyên xwe westandine
û gewrîya xwe ji pifeke xurt ra amade kirîye.

**b. Nîşana yara min zimanekî çeqel e**
Rast e, mirin paleyekî destbikêlindî ye
û rehma wî li saq û simbilan nayê;
lê belê divê serhildêrên bêteşe,
bajarîyên çargoşe
û arodeyên bêpêşe
hilgêr-dagêrên zozanvanîyan ranewestînin.
Her wiha şaş e, ku mirov ava kurdan vexwe
û pesna çaya xelqê bide.

Wisan e, ez ê di bin sîya helbesteke qedîm da
li vê arana germijang rûnim,
gotineka hênik arasteyî civata hazir bikim
û bi gifta vê gotinê pesna yara xwe bidim:
Evîndaran birûyên yarê şibihandine kevanan,
diran berawird kirine bi sedefan,
name mor kirine bi lêvan,
dêm dane kêleka hinaran,
bisk xwar kirine wekî çengelan,
gerden layîq dîtine bi morî û mircanan,
jê weşandine bêhna misk û emberan;
lê belê wan wesfek ji bîr kirîye.

Her wekî ku min berê jî gotibû:
Ez bilûrvanê maran im
û zimanê şahmarekê bêhtir bala min dikêşe.
Gava ez pifî bilûra xwe dikim,
dengên dîtir nabihîzim.
Her wiha gava şahmar hişyar dibe
bi dengê bilûra min,
devê selikê radike
û zimanekî çeqel nîşan dide li min.
De were helbestvano, helbestan birêse!
De were dengbêjo, stranan li hev bîne!

Helbestvano,
madem ku êdî bi jorêş, navêş û jêrêşan hesîyame;
ez ê ji te ra newayekê bilorînim
û tu jî helbestekê birêse.
Para min û te ji vê cîhanê
ne tenê êş û azar in lo!
Ji kerema xwe, li gorî newaya bilûra min
bi zimanê kurdî yê pîroz
helbestekê biçikîne li rûkalê zevînê heftqatî.

Dengbêjo,

madem ku êdî qilpika gazozeke biyanî neksa min naçikîne;
ez ê ji te ra newayekê bilorînim
û tu jî awazekê berz bike.
Para min û te ji vê cîhanê
ne tenê xap û kap in lo!
Ji kerema xwe, li gorî newaya bilûra min
bi zimanê kurdî yê pîroz
stranekê belavî esmanê bêstûn bike.

*15.05.2021; 20:53*
*Bazîd*

**7. Bi evînê dihûnim guliyên te yên sênexî**
Êdî kal bûme ku tu jî dizanî;
ser û sîçeyê te tînim bîra xwe,
lê nifirek di qirika min da dixulxule:
“Rû û rûçikê te li min hesret be!”
Paşê, poşman dibim ji vê nifrînê,
xwe dispêrim keleka girînê
û bê hemd destekî min dibeze nava porê te.
Tiliyên xwe diguhêzim diranên şeyekî,
têlên narîn bi qebalekî şeh dikim;
lê berê ew por
ji ber xebat û xwihdanê gijik bû,
derfeta şeh û şûştinê nedidît
ji gêzîkirin, pehtin û dotinê.
Niha porê te yê qaçîkirî narîn e,
têlên spî wekî sîxurên mirinê xwe avêtine navê,
rojê çend têlên reş û lawaz dadiweşin kêzineke gemarî
û çendên xurt û berxwedêr jî li devê şeyekî asê dibin.

Tu jî dizanî ku çiqasî dexes û çavnebar im ji bo te;
lewra ne wî porê te yê gijik ne jî vî porê te yê narîn tînim bîra xwe.
Ez dêreyekî gulgulî yê kurmancên celalî li te dikim,
kofî-kitanê te yê bi terzê jinên keleşkî girêdidim
û te li hespekî rewan ê qelenderî siwar dikim,
bihareke xweşbihar berê te didime Zozana Şêresyarê,
konê bavê xwe yê 12 stûnî li Gera Waran vedigirim,
te li Kure, Kêrtê Şehîd, Birek û Çehlan digerînim,
semerek pez û çend çêlekan bi te didim dotin,
mendik, cehtirî, çaya biyanî, sîrim, tirşo û selmeskê
bi destên te yên zehmetkêş didim berhevkirin,
rojekê kavirekî didime terkiya te,
dibim dizgînkêşê hespê te
te dibime ser tirba Ehmedê Xanî,
-wî nivîskarê destana Mem û Zînê-
û bi dua û niyazan
wî kavirê goştciwan
wekî boraqekî pêşwext
li ber pêyên te didim serjêkirin,
di pezbirê da porê te li ber şîpê zozanê şil dikim,
di berxbirê da porê te li ber tava arana Noreşînê ziwa dikim.

A wê hingê kêfa min zêdetir bi porê te ra tê,
şeyekî darîn ê kevneşopî hildidim destê xwe,
bi sebra sofîyekî çilexaneyê
di ber ronahîya wê panosa ku yadîgara bavê te ye
vedipelim ber porê te yê destnimêjgirtî
bi dil êşa serê te seh dikim,
bi baldarî têlên li hev aliyayî şeh dikim
û bi evînê dihûnim guliyên te yên sênexî.

*30.05.2021; 15:52*
*Eskîşehîr*

**8. Gerdena xwe veke**
Te berê porê xwe vedişart,
lê guhên te ez dibihîstim,
nalenala min a li gelî-gebezokan
halana xwe digihande te
heke bi vîzevîza bayekî
an jî bi guregura ewrekî
an jî bi qîrçeqîrça berq û birûskekê nehata tepisandin.

Piştra cil û bergan gerdena te veşartin
û ez ê evîndar êdî pir tengezar im.
Şevan ji xewê vediciniqim,
û ji nivînan dipekime derva;
lê nikarim gazî te bikim,
wekî abidekî destnimêjekê digirim,
bi çend rikat nimêjan sawê ji ser xwe difirînim.
Lê mixabin sawa nedîtina te
duayan li min dide jibîrkirin.
Nîvê şevê bi wergerîna li ser kêlekan dibihure;
lê saw, sehm û tasewas nabihurin,
pirs dibine mar û dûvpişk
û li derên min ên herî hesas vedidin.

Heke bawer nekî ku kawis çi ye
û bi tirs veciniqîna ji xewê çawan e,
tu jî min bîne xeyala xwe:
şeveka tarî min li hespekî kihêl siwar bike
şûr û mertalên min bi terkiya min va girêde
û ber bi şer û dozên rûmetê va bişîne.
Îcar bibîne
bê ka tirs û xem çi ne
hêvîdarî û mereqdarî çawan in.
Gava ceribandina te encameke erênî da,
tu bi xwe û min hesîyayî
de gerdena xwe veke.

*04.06.2021; 16:20*
*Bazîd*

**9. Ma te bi Quranê sond xwarîye**

Gelo te li pêşberî dadgehekê sond xwarîye
ku careka din rû nedî evîndaran?
Ma te soz daye tixayekî şeytanî
ku êrişeka bêeman dibî ser dildaran?

Dîyar e ku mamosteyeka te heye,
tu hînî hunerên cenga dildar û evîndaran kirîyî,
rêyên serfirazîya te bi ser şîretên xwe ra
sedemên sernişîvîya te ji dilên wan re derbas kirine;
lê belê te û mamosteya xwe ji bîr kirîye
ku dilê evîndar hesas e,
li ser zevînê xwe
rewşa her çalakiyê tesbît dike
û li gorî daneyên heyî tev digere.

Min bihîst ku te gotîye:
*“Hingî ku xwe nas dikim,*
*min soz daye xwe ku hez nekim*
*û bi niçandinên dilê rezîl*
*xwe li nava eşîrê riswa nekim.”*
Bizanibe ku hemû qanûnên exlaqî û mantiqî
hemû ayînên esmanî,
ceribandinên wan ên li ser rûkalê cîhanê
û hemû pergalên beşerî yên cemawerî
wijdanê dikin fermandarê mirovî.
Îcar heke te bi Quranê jî sond xwaribe
bizanibe ku hemû aliman fetwa daye;
tu dikarî sonda xwe betal bikî
û bi kefaret hînî hezkirinekê bibî.

*04.06.2021; 16:19*
*Bazîd*

**10. Sirgûnê rastîyekê**
Dibe ku maskeyan bêhna te çikandibe,
pûşîyan xeneqa te şidandibe,
an jî roja te bi şevan avis bûbe;
xemê nekêşe
û xewê ji çavên xwe biherimîne.
Vê şeva nîvê şevê,
berê xwe bide qibleyekê.

Heke misilman bî,
Kebeya Şerîf dayne nîveka her du birûyan,
Seh neke hatî-çûyîyan,
nebihîze nav û nûçikên durûyan,
veqete ji hemî kerîyan,
xwe bike xurê gurê vegerê
û bibêje:
“Em ji Xwedê hatine
û em ê li bal Wî va vegerin.”

Heke fileh bî,
berê xwe bide esmanê bêstûn,
li benda Îsa Mesîh bimîne,
silavan ji wî dayîka wî ra bişîne,
dêmeka xwe bide ber şeqamên qederê,
kezeba xwe bike titûn
û bişewite heta mehşerê.

Heke cihû bî,
raweste li pêşberî Dîwarê Girînê
bixwîne bi rewşa hejînê,
bi lavahîyan bike zarînê,
û deh fermanên Mûsayî veguhêze jiyînê.

Heke bawerîya te bi ayînan tunebe,
tu yê qîma xwe neyînî bi şîreta min
û ez ê jî ewle nebim li ba te;
ji ber ku
min ciwanîya xwe peritandîye di rêya Quranê da
navsaletîya xwe terxan kirîye lêkolînên Încîlê
û va ye werdigerînim rûpelên Tewratê di salên pîraniyê da.

Ez sirgûnê rastîyekê me,
xurcikê min bi gilî-gotinên giran mişt tije ye,
ji hewana min a qul tovên bextewarîya îns û cinan dirije,
ne hay ji roja mirina xwe heme
ne jî li benda pesn û sipasîyekê me.
Sirgûna min naşibihe kesadîya bazarekê
û bêmirûzîya bazirganekî çavbirçî.
Wekî sofîyekî heyamên berê,
bi roj li pey qûtê cûcikên xwe me,
bi şev zikr û fikra min çend peyvên serbilindîyê ne,
bi xewnan carinan li welatên nas im
û bi rêya xwe dinasim.
Carinan jî li welatên dûr im,
û wekî toraqa li nava tûr im;
geh bi birînên kurmî dirizim,
geh ji tevahîya derdan dûr im.

*04.06.2021; 19:55*
*Bazîd*

**11. Ez ê îşev bigirîm ji kenan**
Ez ê îşev bigirîm ji kenan bo xatirê hatina yarekê
A ku hat ji pala Laçînê û qayîl bû bi mal û halekê

Bazîd bi meş û sekna wê xemilî, geşeve hat
Lê Laçînê stûyê xwe xwar kir mîna şilêrekê

Ask û xezalên Nexciwanê jî li ber çemê Erez
Bi keser li vî alîyî dinêrîn bi hêvîya serdanekê

Şeva ku rewendîyan ji taxên Laçînê koç kiribû
Pîj û gûnî hêşîn bûbûn li şûna gulan, piştî salekê

Hevalên min wekî berqa birûskê gihiştibûn wir
Malbata wê anîbû, lew dest pê kiribû qeyranekê

Min bi dilekî kul û çavên şil bûyer dişopandin
Lê salixên xêrê aşt dikirin tevzîyên tajanekê

Yara min ji nişkê va hatibû, bi gifta nameya min
Der û cînar jî pê nehesandibûn bi vê koça şevekê

Min gote eşîran: *“Bilezînin, rêya koçê bişopînin*
*Sêva min a mêxikrêj bigihînin wê, wekî dîyarîyekê”*

Rondikên çavên min fena şîpekî diherikîn berejêr
Ji rih-simbêlan derbas dibûn ser sîng bi dijwarîyekê

Min û yara xwe çendîn rojên xweş bihurandibûn
Kon vegirtibûn li kêleka hev li heman zomeyekê

Min çend sexel li ber pêyên wê ser jê kiribûn
Bi hurmet malbata wê vexwendibû şahîyekê

Wê bi qasidan xeber dişand ku bes e, heyfa goşt e
Lê ez difikirîm ku çi teres e, naşêkirîne qencîyekê

Rojekê li devê çemekî rastî wê hatim bê soz û civan
Îcar bi zarê xwe got: *“Bi hestîyekî jî razî me li newalekê”*

Wê înç dikir ku ez î sofî me, lêv gez dikir ji şerman
Min nêta wê derz kir û got: *“Her xanî bi dergehekê”*

Got: “*Qey dergeh bi lêdanê venabin, ne bi xwezîyan?*
*Heke te dil hebe, demildest bişîne xwestinê desteyekê”*

Min bersiv da: *“Rofirînê xwezîyan dibirin xwezgîn*
*Mizgînîyê bide malbatê ku bigihêjin pakbiryarekê”*

Digot: “*Roja min tu yî, hestên min şeveka lap tarî*
*Kebînê egle meke, ditirsim ku bimirim sipêdeyekê”*

Min digot: *“Wisan e, bilezîne, mirin dijminekî har e*
*Jê hartir jî Iblîs heye, rewa dike gunehan bi peyvekê*

*Min gelek bî û keç dîtine ku hestîyarên evînê ne*
*Lê tu cuda yî, min nabilînî bi hêvî û xwezîyekê*

*Va ye tu ne xemxura xeml û eywan û zarokan î*
*Tekane dixwazî razî bikî min bi şênberîyekê”*

Roja ku wê li qûntara Çîyayê Agirîyê sond xwar

Gilî neşikand, koçberî veguhast perwerdehîyekê

Dîsa wê digot: *“Her evîn peymaneke leşkerî ye*
*Tu fermandar î û min qebûl ke wekî suxteyekê*

*Car heye ku bayê hezkirinê mirovî ji rê derdixe*
*Îcar tu ferman ke ne bi dil, lê bi hişmendîyekê*

*Heke xisleta min a hişk dilê te yî nazik biêşîne*
*Min bendeyê seza bike bi şîret û çaksazîyekê”*

Her du çavên wê bi hêsiran gotinên wê dipeyitandin
Awirên min ên rijd û durist ew dibirin bilindahîyekê

Me her duyan dixwest ku hêlîna me dûredest be
Bi perwazeke xurt bifirinê, rê nedin teralîyekê

Qirş û qeselên bejahîyê bibin nivîna me li wê derê
Zag û zindar me biparêzin ji nêçîr û xedarîyekê

Stêrk perdeyên mij û ewran biçirînin, biteyisin
Notla ku gewher bibiriqin li ber ronîya çirayekê

Em bi tena kirasên tenik velezine şevbihêrkan
Ji dil bikin galegalan, ewle bin ji êriş û talanekê

Wê her digot: *“Bi Xwedê, eman nîn e ji destê evînê*
*Qet nabînim raqetîna ruh û cendek bi qasî kêlîyekê”*

Dema ku em bervemal bûn, wê dida dû min qestîka
Da ku pêşên dêreyî bimalin dewsa pêyan li şiverêyekê

Çi gava ku xwezgînan anî mizgîn, em gazî kirin kebînê
Rûniştandin li rex hev ji bo vexwarina tehleqehweyekê

Bêhemd kelegermekê laşên me disotandin li civanê
Gava serên me xwarî hev dibûn notla çiqlên darekê

Piştî belavbûna xwezgîn û mazûvanan me derfet dît
Ji bo axaftin û hevnasînê em derketin şaneşînekê

Navikzirava gerdenberf û biskçengela xwînbizot
Bi min xweş peyivî û ez hênik kirim bi berfeşîrekê

Çermê wê yê bi rengê hêkên varikan ji bin va kelijî
Zîpikên xwihdanê yên pakîze bijiqîn derva talîyekê

Her çend rû li min bû, lê çavên wê li destên min bûn
Kovîkî nedisilikî ji tevgera wan bi tirsa şermizarîyekê

Li bejnê dihat stûyê dirêj bi qasî yê tawiseka qure
A ku boçikê nîvçenberkî peraş dike wekî baweşînekê

Porê wê qey Şîpê Muradiyeyê qetrankî dikişe xwarê
Bisk notla guçlê daran daliqîne bi giranîya mêweyekê

Geh vî porî dike gulîyekê, marekî berdide nava kulangan
Geh dike du gulîyan, berdide ser sîng mîna gerdenîyekê

Gava vedihêsin, kefedestên wê hewirmişê Qezvînê ne
Heman dest bêkêmasî dixebitin mîna nermalavekê

Heta nîvê şevê çiraya wê bi tarîbanê ra dicenge
Bi xwe jî diçiruse notla findeka keşîşxaneyekê

Jineka mîna wê kela mêrê xwe ji bo rûmetekê radike
Dibe mertalê piştê heta ku mêr vedigere şaristanîyekê

Piranîya dildaran piştî hevşabûnekê ko dikin hestan
Lê ez dil bi wan zindî dikim û didimê ciwanîyekê

Kîjan hevrikî an jî şîretbêjî hezkirina te kiribe serhevde
Min zimandirêjîya wî kiş û mat kirîye bi kinebersivekê

Heke rojên reş wekî pêlên zeryayê bi lempereyan werin
Xem mîna kulîyan biweşin ser zevîyên min bi ezmûnekê

Ez ê milên xwe hevbirîngkî biavêjim pêsîra şevereşan
Jehrkî derkevim pêşîya kulîyên xemê, nekevim tatêlekê

Hey şeva ku bi rûreşî û tarîbanan temenê xwe dirêj dike
Ez ê te bi heyveronê bitengijînim û biqewêrim bi tavekê

Hey şeva ku ji stêrkan ditirse û bi xurîcîna yekê dipesine!
Min gelek caran bar pişt kirine, ez ê te jî bikim serbarekê

Bi piştkulî û di nava zûrezûra guran da te derxime ber tavê
Ez ê xwe bigihînim bend û delavan, nedime te çilika avekê

Gava li devê gelîyekî rastî gurekî hatim û porê min vîzvîzî bû
Ez ê agirekî berdim potikê xwe, berê wî şevekorî bidim revekê

Ez ê biqîrime ser û bibêjimê: *“Xisletên me her duyan cuda ne*
*Tu dijîyî û êriş dikî ji bo xwarinê, lê ez dixwim ji bo jîyanekê”*

Li deşt û çîyan rastî çivîk û balindeyan têm ku bêtirs difirin
Mak dişêlînin hêkan, bi pûrta sîngan diweşînin germahîyekê

Hinekan cûcik derxistine, wan têr dikin bi kurm û kêzikan
Hinek jî nezankî bi kimêtê min ra dikevin pêşbazîyekê

Ew hespê min gava orxe dibe, pişta wî textê Cimşîd e
Lê gava radibe çargavîyan, dipeke mîna pêla lehîyekê

Mîna qayîşê vedileze gava dibeze, nal çîkan vedidin
Dengê siman û hûfehûfê dişibihin hilteqîna Tendûrekê

Bi navkêlkeka tajîkî mîna kêvrîşkan dide hevrazan
Berjêran lingên paşîn nizm dike, nade siwêr acizîyekê

Revoyê hespan e, bêhn bi bêhn dibeze ku neweste
Mîna başê kihêlan, biweste jî ranake toz û xubarekê

Bayekî gur e, bejnsivik nikarin dizgîna wî zeft bikin
Azayekî dir e, napejirîne ji siwêr tundî û tûjîyekê

Gava keja stûyî li destan dialînim radibe şekan û dihîre
Nahêle ku qamçî lê kevin, hanzûka suh tê ji zengîyekê

Newqa wî ya xezalkî û çîpên wî yên hêştirmekî
Derfetê nadin reveka loqloqe, dikişe bi kubarîyekê

Ger pêşbînîya xetereyê bike, guhan berepaş mûrç dike
Lê guhan bervepêş fît dike, ger seh bike ewlehîyekê

Qey canîyê mehîna Gur Heso ye ku navê wê Teşî bû
Lew hevaltîyê dike bi siwarê xwe ra hetanî dawîyekê

Gava zerçalê kapsipî diçêre, keç duaya mirazan dikin
Gava zîn dikim ji bo nêçîrê amadebaş e bi şehînekê

Li ber çemê Qeşqeşê yan jî li kendalekî Zemyanê
Dipêm refên pezkovîyan û ji wan diqefilînim yekê

Têjika ku ji kerîyî diqete, dikeve ber çapa tivingê
Mêş digirim, destkuja wê helal dikim bi guleyekê

Kalîna wê halan dide kendalan, wan dike şahid
Ref vedigere morîyên belavbûyî yên tizbîyekê

Wê girêdidim bi tayekî zîn, îcar digerim li dû bizineka kovî
Hey dibînim ku serkêşê kerîyî asê maye li nav tûmê dirîyekê

Sîyarbend digihêje hawarê: *“Nêçîrvano, were ser hişê xwe!*
*Hewla zindîgirtinê axmaxî ye, bikuje û derxe bi firêqetîyekê”*

Çend guleyan vala dikim kefçika dil, cendêk derdixim derve
Diavêjim terkîya xwe, dizivirim hêlînê bi qinyata balindeyekê

Gelî heval û hogiran! Gur û wawîkan xwîn hilkiribû
Heta Besta Zoravayê guhê min neqirîya ji zûrezûrekê

Sipas Xwedêyo, bi silametî derbas bûm ji Pireya Belek
Hê li Mêrga Pîro bûm, hingaft Besta Kurdavayê barijekê

Ewran pêş daxistibûn erdê, bawer nakim çavan çav didîtin

Birûsk mîna destê Mûsa Pêxemberî dixuyan bi ronîyekê

Şexteyekê girtibû ser Sêz, qamîşê Keçelan dikire xesîl
Kêlindîkêşên Hesesorîyan çîlovîlo direvîn bin erebeyekê

Şivan û gavanên Badoyî, Bozoyî, Qadêyî û Xidiraxayî
Kerî û naxir diajotin ber sel û pelan bi mebesta rizgarîyekê

Heyhat ku heyhat, lehîyên şêlî ji newalan diherikîn deştê
Ji Elê diqulibîn Îdirê, rez û bostanên eceman dibirin helakê

Dema ku bi banga berêvarê ra gihîştim Bazîdê, bû hêwirze
Zar-zêç û der-cînar raweşîn hewşê ji bo par û pîrozbahîyekê

Min biryar da ku berxkovîyê bibexşînim Dilşaya Laçînê
Bi urfa kurdan hûr-pizûr bişînim mala xezûr digel hêtekê

Sêlê bidim ser kuçikan, goştê pîlekî zêl kim ji bo hatîyan
Piştî ku gem û zînê hespê daxînim, bitewlînim li mêrgekê

*“Gelî nasan, ev nêçîr wekî bexşîşeka Xwedê bû nesîb*
*Wî ji kerîyekî du heb dan, min jî belav kir bi pîvanekê*

*Tika ye, kesek dilê xwe ji kêmasîya mal û pergalê neke*
*Divê niha herim sujdeyê û nimêj bikim digel sipasîyekê*

*Ez ê îşev têr binivim, bi hilatina rojê ra derkevime Kelehê*
*Fatiheyekê bixwînim ser gora Ehmedê Xanî wekî silavekê*

*Dua û zarîyan pêşkêş bikim li gorî Dîbaceya Mem û Zînê*
*Hêvîdar im ku çend kes bibin şirîkên min bi “amîn”ekê”*

*Destpêk: Êvara 09.06.2021ê - Dawî: 14.06.2021; 01:20, Bazîd*

**12. Tê bîra te Pîroze?**
Tê bîra te Pîroze, havînekê ez hatibûm serfêza Bacgîranê bi mêvanî
Li bintarê Eşkava dixuya, te kêf û şahî radixistin ser sifreya xoresanî

Bi dengê qoşmeyê ra xort û xama radibûne semayê, bi eşq direqisîn
Bi destmal, dêre û tûmanên rengrengî li hev dizivirîn keçen zeferanî

Salarê birayê te bi cil û bergên kumsoran derketibû meydana lîstikê
Te ji min dipirsî: *“Ma tu ne kurmanc î, qey naxwazî bilîzî yan nizanî?”*

Di reqsê da destmala te sist bûbû, gulîya te dixuya mîna rêya Gulîlê
Ez bi dîtina wî porê te kêfxweş dibûm, te digot ketime kulîna mîranî

Li nav Deregezê straneka gelêrî serpêhatîya serdarekî kurd vedigot
Cecoxan û Şasîyarê govend digirt, dîrokê ji nişkê va dikir qulopanî

Destana Eywaz Xanê Celalî û Tofegulê ji nava kavilan dîsa zîl dida
Bûyerên lehengan jin dikirin mertal, didane mêran şûrên hemedanî

Gava ji gewera Şoqanê derbas dibûm, li Warê Kwînda konek hebû
Fenanî laçîneka sêhêkî melisîbû ser sê sêwîyan jinebîyeka aşxanî

Gelo min çav şêlî nekirine, Duçeng mîna deveyeka dukwîne dileqe
Yan çîyayên Hezar Meçîtê sîng dane ber êriş-talana hovên tirkmanî

Qeterên deveyan mîna van rêzeçîyayan kwê digirin, ji hev naqetin
Gava biharan koç-kerî ji aranan hildigerin ber bi zozanên xebûşanî

Payîzan ji Xebûşanê dadikevine Şêravê, ji Şahîcanê ra jî dibihurin
Dadigerin Maraweyê û bi debara havînê dikevin xeweka zivistanî

Berêvara hênik serwanekî deveyan qeterek diajote Merw û Şacihanê
Deveyan mîna dîlên zincîrkirî rêç girtibû, ji bîr kiribû jîyana şaristanî

Buxurçe û meyaçe çeleng dimeşîyan, lê deylaxên nûzayî bi dijwarî
Buxur û meya bi her du hotikên piştên xwe dihatin naskirin bi hêsanî

Bi hotikeka piştê cuda dibûn lok û erwane, bargiran û piçekê pîr bûn
Lokçe û mecîyan jî bi barên sivik rê diqelaştin mîna keştîyên siltanî

Pîrozeyê, hêvîdar im ku tu jî rojekê bêyî Bazîdê, ji bo serdana min
Ji ber ku bi serdanên dualî û hevpirsînê zindî dibin hevaltî û dostanî

Min digote xwe: *“Hingî ku pêwendîya me qut bûye, dilêşî heval e”*
Lê te duh şev niçande min: *“Şevbaş Omito, divê xewnan baş bibanî”*

Xew li min bû kew û firîya, tu çima li min digerîyayî, te çi dixwest
Bi kesera dîtinê û tatêla te helîyam, heta ku zelal bû sibeha beyanî

Ji bo rastîyê min çendîn sal mezaxtin, girnozên nefsa xwe kesaxtin
Xewnerast parek ji şêst parçeyên wehyê ne, min ji pirtûkan dizanî

Loma min xewn gote ifrîtekî cinan, wî got: *“Ez ê we bigihînim hev*
*Dema ku çêrandina mêrg û zevîyan serbest dibe, dadigerin zozanî”*

Lê sofîyekî dilpaqij gote min: *“Dil miqabilî dil e, heke jidil hez dikî*
*Ez ê pêwendîyeka dilan daynim navbera we, qe çênabe destwerdanî”*

Gava min pêşniyara sofîyî pejirand, cama Cemşîdî radestî min kir
Çend iqlîman ji te dûr bûm, lê dîsa bêhna te dihat mîna çaya biyanî

Ez êdî ne ez im Pîroze, min cendek dirandîye û sînor pêpest kirine;
Tu jî berz bifire, pest nenişe, agehîyê wergire ji hesta xwe ya jinanî

Ma te nedilorand: *“Min we xwe ra işqî meke, işqî dekî terkê meke”*
Bawer bike, dengê tevgera te dibihîzim, te ev sêxiştî digot bi stranî

Lew bi sêxiştîyekê nameyekê dişînim: *“Bilind firîm, pest neketim*
*Ji qismetê te erneketim, xemê mexwe silamet im”* li Bazîda Xanî

Gava gihîştim Bazîdê, min dît ku Dibistana Gulnîgarê hilweşîyaye
Kevirên jêr û jorê cih guhertine, tenê tara wê avahîyê li şûnê maye

Ne tenê dibistan; xanîyên torinan, sazîyên serwerîyê gişt tep bûne
Qey ev der ne şûnwarên dîrokî ne, bi destê xêrnexwazan rûxîyaye

Gava ji Keleha Behlûlî siwarîkî derketim zozana me ya Şêresîyarê
Hevalan derz kir êşa min, lew kesî negot dewsa warê bavê te va ye

Gelo li vî warî çi qewimîye, Kula Dotikan ketîye nava Keleşkîyan
Yan Tendûrek ji hêrsan teqîyaye ku bajar wisan ji bin va hejîyaye

Ma dagirker gihîştine lana şêrên Celalî jî, kanê zulfiqarên Heyderî
Çima her kes ketîye heyra nefsa xwe, hişê piranîyê çito çelqîyaye

Ka mîrê Bazîdê yî ku destê wî sîwana serê bendeyên belengaz bû
Dengê karmend û leşkerên wî çima dernakeve, qey hema birîyaye

Hey wax li minê, dam û dezgehên dadwerîyê vegerîne wêraneyan
Çiqasî balkêş e, sûra Baxçeyê Keşîş ji bo gunehkaran hê jî ava ye

Navê Qula Bizinê ji ku hatîye, kê li ser Keleha Ûrartûyan xistîye
Kê şevbihêrka nivîskar û helbestvanan bi kilîteka zengarî dadaye

Daristana Tewekan a dora bajarê kurdan ê qedîm hişk bûye gelo
Yan hinekan ew avêtîye bin sêla cengan, bi êgir û barûtê qelîyaye

Camêr û canikên torin bi ku va çûne, çima segên beytu digerin
Kêlên şikestî, gorên tepisî, kuçe-kolanên vala tijî strî û gîya ye

Birc-dîwarên Kelehê bê nivîs-lewhe mane, delîl li halê nifşa nû
Çima ji kurdan nemaye tu belge-berate, ala-perçem û hêma ye

Kanê bax û baxçeyên kubaran, hîkehîka keç-xortan li nava wan
Rêya deştê ji kengî va bûye reşmarekî tî û bervejor hilkişîyaye

Rawêjkar dibêjin: *“Pîrozeyê vexwîne Seyrangeha Golemasîyê*
*Bazîd ji nû va bê jenîn, hûn her du vehêsin li Keleha Mîrza ye*

*Bila bêfila keleka we pêlên ava Golemasîyê bi şanazî biqelêşin*
*Qey şeva pêşîn a zavê ye, bi coş-peroşî li ber bûkê vepelîyaye”*

Hizirîm ku lêvhingiva min kesirîye, mihtacî hin peyvên şirîn e
Şewqnameya Ibn Xerîbî li dêst, çav li min û nûçeyan delîyaye

Serî bûye hêleçan, çavhêsrî û bi dilkulî li derî û paceyan dinêre
Zîpikên xwihdanê şil kirine kirasê lê ku bê berxwedan rizîyaye

Bi gotina gotindaran goştê heywanên nêr li xwe qedexe kirîye
Suh hatîye ji serşûştinê hingî ku ji min û henekan veqetîyaye

Hinekan digot: *“Çi dixwe, qilqalê wê radibe bi hilqehilqan*

*Çend caran li pey hev bi rengên kesk û zer û sor vereşîyaye”*

Diranên ku mîna morî-mircanan li bendê şimakirî rêzkirî bûn
Niha tev ji ken ketine, her du befşik diêşin û qîlek jî leqîyaye

Stûyê wê yê gulberojkî tînê ji salix û mizgînîyan wergire jî
Hêsir gindirînê jêr, li ser dêmên hinarkî bi kilê reş rê vedaye

Rûyê wê berê notla qalikê hêkê bê qelş û qerçûmek dibirîqî
Lê niha ew rûyê tenik bi sîle-şeqamên bêçaretîyê bizdîyaye

Serpêhatîya wê kela xîreta min rakir, pir aciz bûm ji vê rewşê
Min gote xwe: *“Mirovatî mirîye yan ji esmên kevir barîyaye”*

Çima kêf û zewqa li koşk û serayên beredayî ez dîl girtime
Yan şil-şeht bûme ku nalivim, çavekî min kor e, yek rijîyaye

Sond bi navê Xwedê, ez ê bi gotineka pêşîyan rabim karekî
Bila dubare bikin nifşên nû: *“Siwarê hespê xelqê timî peya ye”*

Nevîyê Evdilahê Qelender ji biryarên cidî û rastîyan şaş nabe
Bi belavkirina pereyan ne girîyaye ne intîyaye ne jî îskîyaye

Ez ê bi hespekî boz î rewan bidim pêşîya siwarên jîr û biçim
Bi aştîyê berê xwe bidim gelê xwe yê ku xîrêtkêş û fehma ye

Lê kambaxa rêya şoşê hişk e, hesp û dewaran taşirxanî dike
Divê em siwarên hevrê rêyên kevneşopî bibijêrin ku hêsa ye

Tikaya min ji hevrêyan ew e, ziyanê nedin çêre û çandinîyan
Mêrê kurmanc seba zevî-mêrgan û rez-bostanan bi mehna ye

Bozê rewan ta heft piştan ji nifşê hespên kurdî ye, ne dureg e
Bi destî perwerdekarekî Keleşkî ji kap û zincîran lap aza ye

Roja pêşbirkan rêza pêşîn nehêlaye ji tu siwarekî celalîyan ra
Tenê di bin min da, bi zîn-pergarên hostayekî makûyî bezîyaye

Ji canîtîyê heta roja îroyîn tenê ez wî diajom, ez wî dibezînim
Bimbarekê bimbarek ne intîyaye-irîyaye ne jî nirîyaye-loqîyaye

Dêlbijîyên wî mîna baskê kevirkanîyekî şivanan hûnandî ne
Bi urfa me, gava roja şer-dozan bên qutkirin, siwar riswa ye

Tûncik û keja por qaçîkirî ne, da ku cihên hesas xwih nedin
Kambaxa xwihdanê şor e, kul dike endamên tenik, bela ye

Em li ser rêya xwe pêrgî çendîn şivan-gavanên gundan hatin
Me dît, kerîyekî çend semerî li çêregehekê xweş raweşîyaye

Şivên bilûrek daye destan, bêhayî me li meqameka zîz dide
Gelo kê newa hîn kirine vî bendeyî, ji kîjan hostayî banîyaye

Gincirên li ser zîvalzîvalî ne, pîneyên dirûyî bûne cînarên hev
Belengazîyê pişt li wî xûz kirîye, porê sêrî kêmekê weşîyaye

Hewana li piştê nîvdagirtî ye, hevalpiştê wî şiveka serçomax e
Dêleka pûrtşutî li hindê ketîye, segek bi arxweyînî velezîyaye

Dêl ku diewte, seg hema vediceniqe, xirp vedihundire ser xwe
Wê hingê şivanê bîlûrjen deng dibire û dinêre bê ka çi rûdaye

Kutî kelban dike, nanekî dike du kerîyan, diavêje ber ajelan
Silava me werdigire, bi mereq dipirse bê ka berê me ku da ye

Ji ber min va ruhspîyek bersivê didê ku em diçine Golemasîyê
Dîsa dipirse: *"Xêr e, vê havîna ku her kes bi karekî bilîyaye?*

*Sexbêrên kerî û naxiran hilgerîyane zozanên Sînegê yên sar*
*Xwedîyên rez û bostanan li aranê, her yek bi karekî alîyaye*

*Niha girtina masîsorkên navdar qedexe ye bi fermana mîrî*
*Hûn bê çek û rext in jî, dîyar e naçine şeran, wisan xuya ye"*

Di nava siwaran da ez ê ciwan bi destekî gazî dikime camêrî
Bi destekî veşartî hinek pereyên gir didimê, bê pesn û pa ye:

*"Xwedê ji bo xwe binivîse û def'a belayan ji me tevan bike"*
Şivan bi devekî ken sêrî dihejîne û dibêje: *"Qey xortê ha ye*

*Yê ku diçe karên xêrê, hertim bi başî û pakîyê tê bîra rûtan*
*Xwedê guwah û agah e ku ji min repalî qebûl e bi dilê şa ye*

*Yeka te hezarî be, bi silametî û serfirazî bigihêjî her mirazî*
*Bê şermizarî vegerî mal û halan, min ji Rebê Jorîn tika ye"*

Em rê bi rê diajone qeraxên Golemasîyê bêyî zîyankarîyan
Hema li devîdevî golê nîvro nêzîk bû, dengê melê û sela ye

Îna bimbarek me hesp kişandin tewleya hespnasekî bavan
Me berê xwe da mizgefta Kelehê bi destnimêj û lahewla ye

Gundîyan kar û bar hiştibûn, navberek dabûne xebata xwe
Dev-diranên wan misilmankî dilivlivîn bi tobekarî û lava ye

Zaneyan Quran dixwend, nezanan guh didêra ayetên evra
Pêşnimêj li ser gotareka kûrwate dihênijî, lew çav miçîyaye

Hey me dît, mela hêdîka hildikişe mînberê bi dua-niyazan
Xutbeyek xwend di heqê mafên bendeyan da, ka çawa ye

Min nihêrî feqîhên hucreyan serîyan bi *"erê"*yekê dihejînin
Nimêjkar jî çav didine wan, diçespînin fermana Xweda ye

Gava mela derbasî mihrabê bû, cimaeta hazir rabû ser pîyan
Te digot artêşa Rustemê Zal e, bi rezm û asayîşekê rêza ye

Piştî nimêjê binelîyan hev ra hev ra gote min: *“Bi xêr hatî*
*Pêş bavê xwe va, kerem kin, mal bi mêvanê mîna te ava ye”*

Rusipîyan sipasîya nasan kir û sedema hatina me ragihand:
*“Em seba karekî xêrê hatine, Xwedê hez bike lawik zava ye”*

Gava min destê segvanê kelehê girt û merhebatîya mîrî dayê
Her kesî fêm kir ku êdî tîr ji kevanê firîyaye, li şûnê çikîyaye

Wê gavê Pîroze hate ber çavên min, îxî meyaçeya xwe dikir
Rêşî, quntuz û zengil girêdidan; têgihîştim ku name hildaye

Destmala ku wekî dîyarîyekê dabû, şil bûye di paşila min da
Dutareke ziravperde bi strana Şarê Can erdê Xoresanê pêçaye

Destpêk: Êvara 18.06.2021ê, Dawî: 23.06.2021; 05:52, Bazîd

**13. Hişyar be ji xewa bêxîretîyê**
Hûn yara min nas nakin,
bi rastî dinya jî wê nas nake,
heta niha kî gotibe nas dikim jî
serê wî lê xistine bi qaydeyekî.
Navê wê ketm maye,
Neçûye dibistaneke bi zimanê xwe;
lê hînî gelek zimanan bûye ji bo olamê:
loma her kes jê re dibêje “Xulamê”

Dibêjin ku bavê wê di şerekî rûmetê da çûye rehmetê,
qaşo pênc mezinên naskirî lê hatine şefqetê
û milkê bavê wê belav kirine li cimaetê.
Dîsa dibêjin ku Xwedêkuştîyê melayekî
bi xet, nivişt û tilisman
qedera wê li ser nalekî hespan nivîsîye
û avêtîye binê golekê;
lewra heta niha şû nekirîye
û nebûye xwedîya malekê.

Hûn ê mereq bikin
bê ka min çawan ew nas kirîye.
Rojek ji rojên xortanîyê
vegerîyam ji xwendin û xerîbîyê;
berî ku bigihêjim bajarê Bazîdê
Çiyayê Agirîyê serê xwe nîşanî min da:
ew serê bi berf û qeşayê pêçandî
wekî xêlîya bûkekê an jî laçika jinekê.
Kêf û hewesekê ez hingaftim;
lê bi dûv ra tajanekê ez quraftim
ji ber lewheyên dora rêyan.
Hemû tabela bi zimanên biyanî bûn,

hinek bi ingilîzî û tirkî, hinek jî bi farsî bûn.
Lewheyên bi tirkî ji bo karmendên Roma Reş,
yên ingilîzî ji bo geştyar û kolêganên rojavayî,
yên farsî ji bo ajovan û mêvanên îranî bûn;
lê ji bo kurdan,
ji bo niştecih û xwedîyên wî bajarê qedîm
hîç lewhe û nîşaneyên bi kurdî tunebûn.
Ez bi wê êş û janê gihiştim nava bajêr,
averêyî tu dikan û firoşgehê nebûm
û min rasterast berê xwe da malê.
Hevsera min a nexwenda ya kurmanc,
zarokên min ên ji pişta min ketî,
xizm û pismamên ji xwîna min,
xezûrgelana min a heta deh bavan gundî
û cînarên min ên heta heft bavan şivan û rencber
giştan gef dixwar li kurdî
bi axaftina xwe ya tirkî;
bi wî zimanê moxol û îlxaniyan
bi wî zimanê selçûqî, aqoyunî, qereqoyunî û osmanîyan
ew zimanê ku piştra bû bendê hevpar ê tevahîya romîyan,
her wiha yê koçerên kafkas û balqanan
û di dawîya dawîn da
bû zimanê rebenîyê yê afgan û erebên koçber:
ewên ku qaşo ji şeran revîyayî,
malên xwe wêrankirî
û kampên penaberîyê hembêzkirî.

Sibetirê derketim bazara bajêr;
li dezgehên fermî karmendên kurdan qira kurmancî dianî,
li kolanê ciwanan pend û laqirdîyên bav-kalan nedizanî,
li banqeyên ribaxur gilêz dikişîya ji devê karsazan,
li dibistanan mêjiyê zarokan dipelixî bi çakûçê mamosteyan
û ji bo xatirê tirkekî an jî kurdînezanekî
li civatan her kes li xwe dibû havî û biyanî.

A wê hingê min nas kir yara xwe:
a ku bi bawerî dev ji xulamî û olamê berdabû,
wekî dedektîfekê serpêhatîya bavê xwe dişopand,
stranên li ser lehengên wê dewrê guhdarî dikirin,
û ji bo şêwirmendîyê li zimanzanekî digerîya.
Wê ez dîtim, ne ku ez li bendê bûm;
Wê ez bijartim, ne ku ez hay jê hebûm.
Berî hevdîtinê
wê lingên xwe daliqandin xewnên min,
piştra dengê xwe di guhên min da xulxuland:
*“Hişyar be ji xewa bêxîretîyê!”*
Ji wê heyamê ye ku her gav du gav vediciniqim,
tevzî cendekê min dihincirînin,
hewl didim ku navê wê bînim bîra xwe,
û qe nebe rûçikê wê bibînim;
lê ew navê xwe bi lêv nake,
ser û sîçeyê rastîn nîşan nade,

qijdeyê wê ji dilqekî derbasî yekî din dibe
û wekî leylaneka havînê zû winda dibe.

Min got ku hûn yara min nas nakin,
bi rastî dibêjim ku tu kes wê nas nake,
û ez jî nas nakim;
lê dizanim ku ew e,
carê bi cil û bergekî tê,
carê bi pendekî çong vedide hişê min,
carê bi rengekî hewesa min digevizîne
û her carê min li pey xwe dixîne.

*08.06.2021; 01:36*
*Bazîd*

**14. Dibêjin**
Dibêjin ku *"sîsarkên gurî"* heft zarokên kurdan qurt kirine
Serê çavkaniya qersî xweş be!
Serên Erez û Kurê xweş bin!
Heyfa min li wê heyfê, Erez û Kur ber bi ku diherikin?
Ferat û Dijle ber bi ku dadikevin
û her du Zêyan digel Xapûrî jî bi xwe re dibin?

*31.07.2021*
*Bazîd*

**15. Erê, hê li vir im**
Demekê ez bûm û dostikeke min hebû,
Temenê min ji yê wê mezintir bû,
Hişê wê ji yê min jîrtir.

Nizanim, gelo wê *"Masiyê Reş î Biçûk"* xwendibû
a wisan xwe berdabû ava çemê Erez
û heta xeniqîna Semedê Behrengî bi ro da çûbû.
Gelo bi kîjan qirş û qeselî va xwe girtibû,
derketibû bejahîya Tewrêzê
û dîsa li min vegeriyabû, nizanim;
lê dawîya dawîn dîsa hatibû serdana min:
bi devekî nîvken î mîna marê nîvkuştî
bi porekî gijik î mîna gûnîyên Berojê Kevir
bi rûyekî qemirî yî mîna kûtekî kelezûrî
bi du dêmên ji şerman sorgevezê xwîna mêrkujekî
bi du lêvên ji tirsan qermiçî û bizdiyayî
bi du çavên ji birûskvedana xewnan veciniqî
derketibû pêşberî min.
Bêyî silaveke edetî gotibû min:
*"Tu hê li vir î, hê sax î, li benda kezîzerekê yî?"*
Devê min fenanî mengeneyekê ast bi ast vebûbû,
çirkeçirkek ketibû nava diranên min qey makîneyeke zengarî
û min bi hêrsa hedarekê bersivandibû pirsa wê:
*"Erê, hê li vir im;*
*lê êdî dilkevir im*

*ji qira bêsilaviyê.”*

*18.08.2021; 14:21*
*Bazîd*

**16. Par vî çaxî derketibûm Bazîda Jorîn**
Par derketibûm Bazîda Jorîn, çûbûm serdana Xanîyî, jêra gorê kendal e
Keçekê duaya mirazan dinehwirand; gava li min fetilî, min dît ku Kejal e

Qederê em anîbûn cem pîrê mamosteyan, lê armancên me cuda bûn ji hev
Li vê cîhanê rasthatineke seyr bû, lewra min gote dilê jar: *“Êdî menale!”*

Min merhebatî da Kejalê bi xatirê bav û birayên ku ji mêj va hevaldest in
Wê bi devkenî got: *“Kê dizanibû ku meger hevdîtina derengmayî îsal e?”*

Min pirsî: *“Kîjan bayî tu ji dûrbajaran ajotî vî alîyî? Ma te xêr e li vir?”*
Wihareng bû axaftina me, her yekî me serpêhatîyek vegot bi reh û rîçal e

Kejalê pirsî: *“Hevalo, ma tu ji me xeyidîyî? Te çima nepirsî temtêla me*
*Roja bêbavên dereke êriş anî ser malbatê, te negot ka çi hal û hewal e?”*

Tûk di qirika min da ziwa bû, min bi zorek û du belayan bersivek dayê:
*“Delalê, ez ne suh hatime, ne jî ji dîdara we têr bûme, derew pir webal e*

*Piştî ku ji ba we hatim, êş-ûşên min ên kevn teze bûn, birîn dîsan axivîn*
*Ji Zaxoyê heta Bazîdê nalîyam, li rêyan kes tunebû rondikên min bimale*

*Bi mehan li ser piştê veketim, parxan-parsîyên min ji nivînê bêzar bûbûn*
*Tu dizanî gava derd-kul bi cendêk radibin, ne dibêjin pîr e ne jî bejntîtal e*

*Da ku dilê min nekeribe, min guhdarîya nûçeyan ta demekê rawestandibû*
*Min digote xwe: “Şerê hanê yî neheq zilm e, dawîya sitemê teqez zewal e*

*Bawer bike, min bi hêsiran dil dikewand û jêderkên çavan dimiçiqandin*
*Bi sîmyayeka kevn pola bi dest dixist ku nedim nexweşîyê fesal û mecal e*

*Min êdî ken û girî ji bîr kiribûn, bawerîya min ew bû ku dê têk biçin hov*
*Min wisan dihesiband ku ev artêşa Ebrehe ye, bi rênasîya Ebû Rexal e*

Kejal hate deng: *“Hevalo, ew sûresateke pir giran e û rewşa me jî qels e*
*Reng e ku malbat dîsan zîyanê bibîne, ebebozan nîn e şefqet bi misqal e”*

Min gote wê û aveka Kanîya Qiçîyê li dilê lerzetayî reşand da ku vehêse:
*“Berxê, li pêş me hemûyan mirinek heye, dawîya her kesî heman kortal e*

*Min gelek agirên nemrûdî û mencenîqên rakişandî dîtine li vê cîhana pîr*
*Brahîmên pûtşikên doza xwe nafiroşin, nabêjin kanê yar û mey û pîyale”*

Keçik li ser vê gotina qerase dihizirî, li rewşa min a bê çek û rext dinihêrî
Te digot ji xwe ra dibêje: *“Vî lokê kêş parsenga dêv nîn e, çi devçewal e”*

Lewra min hewl da ku şaşîya xwe sererast bikim, şerma xwe binuxêmim

*“Li vê jorê zozana me heye, navê wê Şêresîyar e, hewaya wê pir delal e”*

Wê ez bersivandim û got: *“Rast e, hewaya delal ji bo kal û pîran baş e”*
Min ew vexwende bêhnvedanekê: *“Şukir li ba me êwirandin bipergal e”*

Da ku bawer bike, min pertafek kir: *“Mala min mizgeft e û ez jî mela me*
*Exlaqê bîyanîyan dûrî me ye û qanûna heramzadeyan li nava me betal e*

*Dixwazî -heta xweş bî- li ba me bimîne û bi urfa me bigihêje mirazê xwe*
*Li warê me her kes xwedîyê kar û barekî ye, bêxebat hertim rût û repal e”*

Wê bi ken got: *“Li gor qeydan biyanî me, kebîna bi bineliyan dijwar e?*
*Heke em bibêjin kebîn rewa be jî, lê dilê min canikê bi camêrekî rewal e”*

Li gorî wê canika xama ez melayekî pîr bûm, ji şûkirina wê pir dûr bûm
Gotina wê birîna min a kalbûnê vekola, nehîşt bigire hîç qertîş û tetqal e

Beşeve hatim, min hanzûka ew dilnîya kir: *“Lez nekeve, hûr-dûr bifikire”*
Terafeka xwihê ez girtim, li xwe fikirîm, min ji gotinan girt şewq-şemal e

Min nihêrî ku gotinên pûç pere nakin, min xwe bi zanatîyê danî li ba wê:
*“Fehmdarî ye, tu xwenda û dinyadîtî yî, loma zimanê te şûrekî bisîqal e”*

*“Belê, li zanîngeheke Kurdistanê dixwînim, lê heta sê mehan betlane ye;*
*Ez ê li deverine bajarê te bigerim”* bersivand Kejala ku bi husn-cemal e

Min axaftin kudand: *“Bavê min hertim digot: Lawo, ez kurmancekî reş im*
*Nexwendî me, hemû zanyarîya min bi bihîstinan e, lê hişê min hê zelal e”*

Kejalê got: *“Lê tu jî xwenda yî û qenc dizanî ku Ebrehe û Ebû Rexal kî ne*
*Min tu wekî karsazekî nas dikirî, lê va ye karê te ne tenê dolar û rîyal e”*

*“Bi geşt û galegalan em diravan jî kom dikin, gelek agehîyên kêmnas jî”*
Min bersivand, lê hêvîyekê ez ajotim mîna korê ku nabîne li pêşîyê çal e

Min di dilê xwe da got: *“Ev devgilêzî ji bo destdirêjiyê kapê xapan e lo*
*Şaşikên melayan li dojehê disojin, wijdanê ji xwe ra bike şûr û mertal e*

*Bila çivîyên te sist bin, te bi lez necehişîne bedewîya keça hevaldestekî*
*Rêya camêran bişopîne, her liv û tevger ji kesê bawermend ra ne helal e*

Lewra min barijeka pirsan lê reşand: *“Pirs ne şerm be, çi beşê dixwînî?”*
Gava got: *“Beşa Mirovnasîyê”,* min gote xwe: *“Hey wax ev çi radîkal e”*

Êdî min dev ji tolaziyên xurifiyan berda, hewl da ku Bazîdê bidim nasîn
Demildest çavên min ji kêfan biriqîn, li hev rêz bûn kevnexewn û xeyal e

Min bizavek da xwe, hilmeka kûr da û hilda, paşê efsaneyek gote canikê:
*“A han Gilîdax e, ji kurdan ra gilî û ji neyaran ra daxeka lap sergopal e*

*Li gorî efsaneyê ev malbata çîyayan, çar heb xwişk bûne û bezîyane hev*
*Dayika wan Tendûrekê nan pehtiye, bavê wan Elegez li Aranê bûye pale*

*Kekê wan Sîpan li Xelatê şivanê kerîyekî pêz bûye û kalikê wan ê Cûdî*
*Baxçevanê mîrekî bi navê Şamêr Axa bûye, Gabar jî yan ap e yan jî xal e*

*Bav Elegez ji hoza Zagroj bûye, dêya wan Tendûrek jî ji eşîra Tîroj hatiye*
*Rastiyê bixwazî, Zagroj û Tîroj du kurên Mad in, ew jî lawê Pîr Şengal e*

*Li gorî çîrokê xweha mezin destgirtî bûye û gelek quretî li biçûkan kirine*
*Loma xweha jê biçûktir nifireke nebihîstî lê jeniye bê xem û fikr û mitale:*

*'Hey pozbilinda bêînsaf! Tu me zehf dipirçiqînî, gumana min ji Xwedayî*
*Serê te ji mij û dûmanê vala nebe, li şûna xêliyê berf û pûg li dorê biale'*

*Hêrsa xûçê hatiye, loma jî gotiye xwişka ji xwe biçûktir: 'Hêvî ji Xwedê*
*Qirika te ji têhnan biqirqiçe, marekî dêm te bigeze an jî dûpişk û kevjal e'*

*Xwişka sisêyan û ya biçûk ketine navbera du mezinan da ku şer gur nebe*
*Lê pehînek li zikê biçûkê ketiye, navê wê jî bûye Girê Zikdiriyayî derhal e*

*Xwenga sisêyan nikaribûye vî şerî rawestîne, lewra navê wê Bêçare maye*
*Mixabin nifirên wan qebilîne û her yek bûye çîyayekî serbixwe bê pirole*

*Gava Tendûrekê bihîstiye xebera reş, kiriye hilqînî û hema li wir can daye*
*Elegez giriyaye û gotiye: 'Dê û keç mirine, maye her ez û ev kurê tifal e'*

*Rondikên çavên Elegezî bûne du çeman, navên wan bûne 'Kur' û 'Herez'*
*Sîpanî wê şevê xewneke tevlihev dîtiye, lê nedîtiye ji xewna xwe ra meal e*

*Ew ciwanekî xemsar bûye û derdê wî berhevkirina qelendekî bûkan bûye*
*Loma jî li şûna xwe bûye çîya, ji ber ku gotiye: 'Welatê me pir xweşhal e'*

*Cûdîyî gotiye: 'Ez pîremêrek im, gotî ew werin serdana min û ez nikarim'*
*Gabarî di geliyekî da pez-dewarê xwe çêrandiye, tu dibêjî qey ker û lal e*

*Endamên vê malbatê gişk bûne çol û çîya, bi boneya nifrîn û xemsariyan*
*Kesî derdê kesî nepirsîye, çêr-dijûnên sik li hev rêz kirine bê xem û bal e"*

Piştî vegotinê êdî qirika min zîwa bûbû, min şûşeyek av bi ser xwe va kir
Kejalê got: *"Sihetxweş, te bi vê çîrokê ruh da ber çem-çîyayan bi fesal e"*

*Destpêk: 20ê Tîrmeha 2021ê; 00:24*
*Dawî: 15ê Mijdara 2021ê; 06:46*
*Bazîd*

**17. Îro Newroz e li dilê min ê agirdadayî**
Îro Newroz e,
roja serkeftina pîroz e
li ser erdnîgariya Şahnameyê
û xasma li ser nexşeya Kurdistanê,
li wê devera ku bi navê "dilê cîhanê".

Îro kurd û aryayînijad

ji pişt xaçên kolêgan û malekanan
ji pişt stêrka şeşkujî ya Dawidî
ji pişt heykelên Bûda û Brahmayî
ji pişt das û çakûçê Çîn û Maçînê
derketin û kişiyan meydanan.

Îro mîr û serdarên kurdan
tawanbarên pîşepak ji telaqreşan veqetandin
û bi fermaneke mîrî bexişandin civakê.
Îro tava Kurdistanê
bi qasî têra salekê
germahî û ronahî bexişandin heyv û stêrkan.
Dîsa îro agirê Newrozê
çendî û çend bizot belav kirin
li ser findankên perestgeh, dêr û kiniştan.

Nîvro
beşdarên Newrozê
mîna perperokên li dora mûmên şevane
li çep û rasta wî agirî zivirîn,
ji tîna wî agirî ken û şadî hilçinîn,
li ber wî agirî govend gerandin û tilîlîn.

Gava ku hest û helbest
li derê dilê min dixin,
êdî berêvar e;
dema vegera wê gelheya pîrozwer e.
Di nava wê sûresata mirovan de
diyar e ku ez jî li xwe vedigerim,
lê di nava laşê min î sist û westiyayî de
şiyar e dil û li te digere.

Berî ku wêneyê te
di bîra min de vecinige,
ji nişkê ve çawa bû nizanim,
çavekî min tu nas kirî
û çavê din bawernekirî.
Çivî û hestiyên te sist bûbûn
ji şêxanî û hilperkeyê;
lê şewqa rûyê te yê etlesî
şemal dida xemla dêreyê melesî,
kofiya te bi xişran diçirûsî
û dimeşiyayî digel hevaldestikan
bi heybet û ihtişameke tawisî.

Ez li rasta refên mêran dimeşiyam
û tu li çepa refên keçan.
Nizanim, piştî çend gavan
navbera me gihişte du bihustan
û me tîn ji hev girt
bi qasî têra temenekî.

Edî em ê dest bi dest vegerin malekê;
hilpesirin û vehêsin li eywanekê.
Wekî her mêrê kurd
ez ê cil û bergên xwe yên Newrozê hilawêsim
li bin yadigariya Direfşa Kawiyanî,
velezim ser kulavê xuristanî,
palgehekî bidim berpala xwe,
guh bidim çeperên merzan,
hembêz bikim babelîskên werzan
û temaşe bikim rojeva cîhanê.
Tu yê jî av û mêweyan bînî,
destexana şîvê raxînî,
siniyan li pey siniyan bigerînî
û vê şevê min bibehecînî
bi naz û endazeya xwe.

Êdî nîvê şevê ye,
hîkehîka tenê min e li ber straneke şevînî ya nifşên ciwan
û tu bi rîtm û ahenga santûrakê dixingilî nivînê:
Were, em tovekê biavêjin jiyanê.

*Newroza 2722an, 03:23, Bazîd*

**18. Ditirsim**

Ditirsim ku gotin
ji mebestê spîltax derbas bibe
û ez dilê te bişkênim
an jî kenê te birîndar bikim;
gava lê vegerim
an jî bêriyê bikim,
wî kenî û wî dilî êdî nebînim.

Ditirsim ku raman
li navendê biçikile
û ez pirtepirta dilê te nebihîzim
an jî bi hestên te re nefirim;
lê gava hişyar bim
û ber bi te hilbaskî ewran bim,
dibe ku qudûmşkestî bim
û derman nemîne di baskên min de.

Ditirsim ku kirtim kirtim
te bi qasî zimanê kurdî hez bikim;
ji ber ku zimanê kurdî:
-her wekî min û te-
dişibihe herka Ferêt û azweriya Dijleyê;
di hembêzan de Kerbela û Necef dixijikin zeryayê
û di dilan de meqameke hisênî dilorinîn ser cefayê.

Ditirsim û dizanim ku
*“Tirs gunehê herî mezin e.”*
digot Pîr Heyderî;

lê dîsan jî ditirsim ku
tirsonek an jî bêtirs bim,
ji ber ku cîranên axmaxiyê ne her du jî.
Her wiha ez bi evînê aliyame
di nîveka dilê te de
û bi kenê te baniyame pêkvejiyanê;
îcar tu çima bûyî ruhê nav cendekê min?
Ditirsim ku bersiva te jî
evîn û kebîn be,
roja ketin û rabûnê her li kêleka min bî
û berî min derbazî berzexê bî
da ku bihuştê amade bikî
roja sûr û siratê
dema wê hêwirzeya mexlûqatê.

*19.09-14.10.2022*
*Nazillî, Meletî, Bazîd.*

**19. Bibexşîne, êdî nikarim!**
Di wê şeva zîz de
cixareya min a erzan qediyabû;
loma min ji kerban nivişta mirazê xwe şewitand, dizanî?
Ne tu li tenişta min bûyî ne jî kesekî dîtir,
dema ku serxweşek bi himehimeke nenas ji kolanê dibihurî;
wihareng min dengê te jî nedibihîst,
lê motorên fabriqeyan fenanî vilçevilça kerxaneyekê dixebitîn,
segên bêxwedî li ser dêleke tele digirijîn hev
û baca deyûsan berîka min a çepê qul kiribû
(a ku pere-pûlên hûrde giranî li berxwedana wê dikir
û mixabin negihişt mirazê xwe ku destheqa gulekê kom bike).

Wekî ku min got:
wê şevê ez tenê bûm,
heval û hogirên min vekişiyabûn şevbihurkên rengîn
roja ku wêneyê me yê hevpar winda bûbû;
lewre ew niha li pey dîmenguhêz û wênegiran kaş dibin
û min ji wê hingê ve waneyên din bijartin
ji pêrista hêviyê û naveroka dîrokê.

Bibexşîne, êdî nikarim;
*“nikaribûn”* çi ye, dizanî?
Min wê şeva zîz heta berbanga ezîz
kêç û sipihên *“qey”* û *“gelo”*yê kuştin
di nava cil û pertalên ihtimalê de
û ew biryara dawîn ragihand ku nikarim.
Bibexşîne, êdî nikarim
bi bivirekî devko
şehrega keserê bibirim ji nişkê ve,
vê êrişkara şev û rojê bixesînim
û navê sunetê lê bikim bi neheqî.

Ma ez ê çendbare bikim?

Nikarim li rewneqa rûyê te nenihêrim û xwe ji tarîbanê biparêzim,
nikarim dengê te yê nazenîn nebihîzim û bi aramî binivim,
nikarim li pêşberî te bêdeng rûnêm û divê biaxivim:
nikarim, nikarim, nikarim...
Bibexşîne, -piştî wê şevê û wê şewatê- êdî hîç nikarim;
tu jî têdigihêjî *"nikaribûn"* çi ye, ne wisan?

*19.10.2022*
*Bazîd*

**20. Çend şîretên sofiyê qiyametê**
Bi rastî navekî wî hebû,
qencekî Xwedê lê danîbû
û wekî nasnameyekê kiribû berîka wî;
lê ji ber şîretên xwe yên rasteqîn
nav û nûçik bi ser xistibûn
ribaxurê kurê tepesero.

*"Dîzek dikele;*
*heke pareke layiqî min ne tev be,*
*hez dikî bila seriyekî segan tev be."*
gotibû sofiyê qiyametê carekê;
*"Nanê kurdan dixwin; lê pesnê xelqê didin."*
gotibû çendîn caran.
Mixabin van rojan
dev ji şîret-mîretan berdaye
bi hinceta ku şîret peymaneke dualî ye
di navbera dayî û hildayî de.

Her çawa hebe,
bi pirs û pirsiyaran
min çend gotarên wî yên navdar peyda kirin ku dibêje:

*"Heke bi lekmekî ristemî dev û diranên wehşetê hûr-xaşe nekî;*
*tu dê di ber siya pûtxaneyekê de bêhna bihuştê jî hilnekî!"*

*"Hêrsokê bêteşe, bajariyê çargoşe û arodeyê bêpêşe bervepêş nekêşe."*
*"Di bin vî kevirî de marek heye, nexwe çima Kurdistan vala dibe, ev çi îş e?"*

*"Xwengê, birako dewran guherî; mîza mêvanê me ne paqij e."*
*"Germ ew germ e, xwedî bide ser me, hevraz-berjêran bide ber me û qûn jî vîjevîj e."*

*"Got: <Bijî Manûkyan> û vepeliya ber karxezalê;*
*Dê hişt li kelefeyekî û xwişk li newalê."*

Sofiyê qiyametê mirovekî sosret e;
li ser evînê jî çend tişt gotine,
lê baş nehatiye tomarkirin ku dibêje:

*"Roniyeke xwedayî ye evîn,*
*cureyê mirovî diparêze*
*û bi çavan nayê dîtin;*

*heta hezar carî mezin nekî*
*bi cama dûrbîneke pêşketî*
*û hewesa miletekî paşketî.*
*Ji ber ku razên jiyanê dihewîne*
*û hiş nagihêjin qewareya wê.*
*Bila ewqasî bibêjin ku me hefsarê cîhanê girtiye,*
*êdî em her tiştî dizanin,*
*bi radar û komputerên karebayî*
*kanzayên bin-erd û kakilê atomê bi dest dixînin;*
*lê derew e, ji wan bawer nekin!*
*Evîn razeke devgirtî, sergirtî û dorgirtî ye mîna jiyanê.”*

Hinek gotinên wî yên tekane jî
li ser zarê jinan belav bûne ku dibêje:

*“Wekî ku sofiyê qiyametê gotiye:*
*<Aliyek hîrehîr e,*
*aliyek horehor e.>”*

*“Tu jî pirsên sofiyê qiyametê dipirsî*
*ku carekê gotiye melayekî:*
*<Mehdî yan noterê sitemkaran?>”*

*“Çerxê heta niha pêxas bû û dinya xera dikir;*
*îcar niha çarixek jî kirine piyan!”*

*“Te çiçikê diya xwe jêkir û sibeh li te pak bû;*
*lê goristan jî ewqasî ne ewle ne, bizanibe!”*

*“Meriv di hotika piştê û qelşa destan,*
*ancax diçe civata pîrên xurifî.”*

Çend salan piştî helbestê,
min çendek gotinên wî kom kirin bêyî tu mebestê;
hêvîdar im ku hûn digel hezkiriyên xwe biçin bihuştê.

*20.10.2022*
*Bazîd*

## 21. “Hilbijêre” ji Nezar Qebanî

Min destûr daye te ku hilbijêrî:
an mirina li ser sîngê min...
an jî li ser defterên helbestên min...
Evîndariyê hilbijêre... an jî bêevîniyê;
heke nebijêrî, ev newêrektî ye...
Ji ber ku devereke navîn tuneye
di navbera bihuşt û dojehê de...

Tu hemû rûpelên xwe biavêje...
û ez ê jî bi her revê razî bim...
Bibêje... bilive... biteqe...

Wisan mîna bizmarekî çik nesekine...
Ne mumkin e heta hetayê rawestim
wekî qirşekî di bin baranan de.
Ji du qederan yekê hilbijêre;
Ji ber ku qederên min pir dijwar in...

Tu westiyayî yî... û tirsiyayî yî...
Gelekî dirêj e... kar û barê min.
Noqî zeryayê be... an jî bi dûr keve
Lê zeryayeke bêdîwar tuneye...
Evînî rikeberiyeke herî mezin e;
Soberiyeke li dijî herka avê ye,
Tund e... renc e... hêsir e...
Rêwîtiyeke di navbera heyvan de ye...
Tirsa te canikê min dikuje lê lê
a ku li piştt perdeyan xwe dihêvose...
Ez bi wê evînê bawer nakim
ku serhişkiya serhildêran nakşîne...
hemî sûran hilnaweşîne,
mîna bablîsokê ranabe...
Ax... xwezila evîna te ez qurt bikirama,
mîna bablîsokê ez ji binçirkê ve rakirama...

Min destûr daye te ku hilbijêrî:
an mirina li ser sîngê min...
an jî li ser defterên helbestên min...
Evîndariyê hilbijêre... an jî bêevîniyê;
heke nebijêrî, ev newêrektî ye...
Ji ber ku devereke navîn tuneye
di navbera bihuşt û dojehê de...

*20.09.2022*
*Bazîd*

**22. Sê bîranîn**

***I. Rindê, tu qedera min î***
Rindê, ez xaleke zanistê bûm li nava şûşeyeke hibrê, te ez bi kar û bar kirim
Te ew xal wekî mûrîyeka karîbar danî nîveka her du birûyan, ez aşîkar kirim

Kê dizanibû ku ez xwînek im, di rehên Mistefayê Keleşkî da berejêr dikişim
Li nava batûyên wî dibime avikeka genî, lê te ez pekandim û herikbar kirim

Te Xatûna Keçelî ji Helacê anî Noreşînê, bi Mistefê ra kire hevnas û hevser
Ez jî wekî zarokê pêncan nimandim, bi tovekî nuwaze li rehma wê bar kirim

Neh mehan di zikê wê da wergerandim, giyan da ber cendekê min bi pifekê
Piştra bi tenduristî ez daxistim rûkalê cîhanê, ji têkoşîna jiyanê haydar kirim

Li çol û best û beyaran gogelîska li ber bê bûm, totî kortal û newalan dibûm
Toterîka destê zarokan bûm ku te ez kirim ajovan, li wê toterîkê sîyar kirim

Min î çi zanibû xet û nivîs çi ne, helbest û pexşan çi ne, gotar û weşan çi ne
Te ez bi destxeta xwe nivîsîm helbestkî, li enîya gotar û pexşanê cîwar kirim

***II. Sêvê, te ez ji gola xwînê derxistim û spartim dotmamekê***
Sêvê, te mêxikên min rijandin çemê Noreşînê, ez li Bazîdê xwendekar kirim
Kirim hevala dotmama temenbiçûk ku hêlîna xwe şehitand, lê ez bisitar kirim

Roja ku tu çûyî, min ji kerban ew sitar şewitand û li evînekê geriyam şevero
Da ku li kolanên bajêr bi tol û sûtalan ra şeveder negerim, te ez xewar kirim

Min di wan xewên dirêj da pir bextewarî û şepirzetî dîtin, çendîn veciniqîm
Te bi xewnên şevan kaşî cîhana xeyalan kirim û bi vê zanistê ez werar kirim

Nizanim, min çendîn cure şirînahî û tehlayî tehm kirin bê evîn û bê hezkirin
Di dawîyê da te evîn kir tayê barekî û ez di tayê din da şad û bextewar kirim

***III. Evînê, êdî dizanim ku tu bi tîra kîjan nêçîrvanî hatiyî kuştin***
Tu mîna çiyayekî pir dijwar derketî pêşberî min, lê te ez wisan berwar kirim
Da ku tirsa min bifire, ez berwarkî meşandim; heta ku li lûtkeyê dîyar kirim

Sala ku çûme Agiriyê, te ji zindana xwe ta jûra min erd qelaşt bi pencirûkan
Di dawîyê da te ez birime tenişta xwe, sipartim helbestan û bi xwe har kirim

Te ez li kihêlekî kimêt sîyar kirim, bi def û şabaşan şandime Stenbola xopan
Te ez dame ser pişta teyrê sîmir, guhastim Misira eyûbîyan û tehsîldar kirim

Dema ku li Qahireyê bûm, nameya hevalekî xebera cirnexweş gihande min
Lê min bi kaxeza bêruh bawer nekir, heta wijdana şahidekî ez agehdar kirim

Şahidî digot ku hevrikekî min lana te şêrejinê nîşanî nêçîrvanekî bîyanî daye
Bizanibe ku nifirên te mala bayîsan hilweşand û ez ji bêbextîyê rizgar kirim

*21.10.2022*
*Bazîd*

**23. Dilo, hilo; êdî bes e!**
Dilo, hilo! Hey haviyê havînan, tolaz û sawiyê zivistanan, êdî bes e!
Biharê geş, havînê terixî, payîzê westiyayî yî û zivistana te refes e.

Seba tayek porê yarê heft pûtan bi carekê dihebînî mey li dêst;
te yar kiriye keybanû, dayika qijik li ba te bûye bihuk û teres e.

Dilê dayikê li Mizgefta Qûbayê diavêje, te hay jê nîn e rebeno!
Ma nabînî li ser lêvên yarê pûroyeke Kûbayê çawan diçirûse?

Te deng, reng û qijdeyê dayikê daynaye cemreya recma şeytên;
yar bi stran û sirûdên biyanî mijûl e û tu diçî tewafê bi hewes e.

Ji niç û nûçikên min direvî tev refên Afrasyabê tûranî bêşerm;
Viçekê li dîwarê bavo dixî, hildiweşînî û dibêjî: *“xan îro nehs e”*.

Ji şîretên min ditengijî û beşdarî waneyên felsefî yên Arîstoyî dibî;

Lê ew ê were serdana zomeya te jî digel Skender û artêşa qerase.

Bîzê xwe ji ava sûsê ya xwezayî dikî, harane dinoşî qimiza Tîmûçînî;
ew ê jî kurê xwe Hola-Gû bişîne ser hoza te, ji cendekan çêke helîse.

Berê, erê gelekî berê, te qada Aranê tijî pût kiribûn bi pîşesaziya Azerî
Ew bavê ku kurê xwe yê Brahîm ajote Şamê, rev lê kir xûy û piyase.

Min carekê gotibû: *“Dilo, nerencîne giyanê Brahîmî, wî penaber neke!*
*Dê nifşeke xwe dayîne Qudsê ku xwîna zarokên te bi zêr û zîv bialêse!”*

Carekê jî wiha gotibû: *“Dilo, ciwanê pûtşikên neqewêre, koçber neke!*
*Ew ê nifşeke xwe dayîne Mekeyê, bêyî ku kesek û ruhê te pê bihese!*

*Dibe ku rojekê yek ji wê nifşê rabe û bi şûr û mertal were pêşberî te;*
*bibêje: <Ez ji mala Xwedê têm, ji nifşa qewartî me, radest be, netirse!>”*

Berî ku Ke’be bê jenîn, mala Xwedê tu bûyî dilo; gerdûn li dora te dizivirî!
Gava şêlî bûyî, îcad bû şexşêbexşê; zanist û hişmendî firiya, çikiya henase.

Gava te dest ji dergeh û kana Yezdanê dilovan şûşt, rût û repal mayî dilo;
Te çav berdan kaja leşkeriyê û paşguh kir ku gund an jî bajar çima ditirse.

Ne ku li ser sergoyên biyanistanê ewlehî û aramî peyda dibin bêxebat!
Li kanên nava xwe şiyar be, binêre Iblîs çawa pêwendiyan rîskî dirêse!

Dilo, hilo; ey haviyê havînê, sawiyê zivistanê, bişkovê biharê û belçê payîzê!
Pût û latan pêpest ke bêrehm, bêyî mey û şerxweşiyê evînê binoşe, veterise!

*28.10.2022*
*Bazîd*

**24. Evîneke bêsînor, helbestek ji Nezar Qebanî**
Lê lê banûya min,
tu jineke hera giring a dîroka min bûyî
beriya ku sal dagere;
lê niha, tu jina hera giring î
piştî jidayikbûna vê salê.
Tu jineke wisan î ku bi saet û rojan najmêrim.
Tu jinek î
ku ji mêweya helbestê hatiye hilberandin
û ji zêrê xewnan...
Tu jinek î
ku di laşê min de dijiya
berî çendîn milyon salan...

Banûya minê,
heyla ji pembû û mijê ristî yê.
Heyla baranên yaqûtanê...
Heyla rûbarên nehawendanê...
Heyla rêla mermeranê...
Heyla ku bi ava dilî wekî masiyan dikişe

û di her du çavan de wekî refeke kevokan dinişe.
Di peroşiya min de
tu guherînek dê çênebe
di hestên min de jî
di wijdana min de jî
di baweriya min de jî;
ez ê hertim li ser dînê îslamê bimînim.

Banûya minê,
guh nedêre çirkeçirka gavên demê û navên salan!
Tu jineke çê yî û tu dê herdem wisan bimînî.
Ez ê ji te hez bikim
di destpêka sedsala 21ê de,
di destpêka sedsala 25an de jî,
di destpêka sedsala 29an de jî.
Ez ê dîsan ji te hez bikim,
dema ku ava zeryayê ziwa bibe
û daristan bişewitin jî.

*31.10.2022*
*Bazîd*

**25. Ka were meydanê, helbestek ji Nizar Qebanî**
Cananê,
ka bila werin meydanê!
ew kesên ku berî min çavên te dîtine;
ewên ku tavê hildigirin li ser kefedestan
û defşeyên gulasmînan.

De bila hemû nas û dostên te derên meydanê,
ewên li zeryaya bêrîkirinê dînbûyî û windabûyî.
De bila ji te hez bikin,
bi şêwazê min,
bi perwaza min
û bi delodîniya min.

De bila derên meydanê
pirtûkên evînê û destnivîsên wê
yên ji hezar sedsalî bi vir de;
di nava wan de pirtûkekê tenê nabînî banûya min,
ku qala min nekiribin.
Ka tu were meydanê
û nîşanî min bide
welatekî mînanî devê min
û nivîneke germ a mînanî çavên min.

De bila gişt derên meydanê!
Îcar ka dikarin binivîsînin
ji bo te eşqnameyan
mînanî nameyên min ên evînî.
-Her çiqasî pirhejmar bin jî-
Ka dikarin mîna min

tîpan li dû hev rêz bikin
û gotinan li hev girêdin?

De were meydanê
Ka ji nava hezkiriyên xwe navê mêrekî bikêşe
ku çavên te mişt dagirtine bi havînan
û bi pîrozeyê zeryayan.

De bila derên meydanê,
hemû ferhengên evînê yên sedsalên cihêreng
û kevnenivîsên li ser bedenên Seydûn û Sûrê.
De bixwîne rûpelên herî kevnare yên eşqê;
lê tu dê hertim rastî min werî di nava risteyan de.
Ez di nîveka evînê de dijîm
û qibleyeke wê nîn e
ku bide û bistîne.
Her wiha ez tê de ne xuya me ne jî winda.

De bila derên meydanê,
wêrektirê siwaran û salixgerên eşîrê.
De bila derên meydanê,
kesên ku ji te hez dikin
û kesên ku tu ji wan hez dikî,
ji roja jidayikbûna te
heta bejnavêtina te ya wekî darxurmeyeke iraqî.

De bila gişt bi hev re derên meydanê!
Ka dikarin bibin dilopeke biçûçik a zeryaya min,
ka dikarin damirînin temenên xwe
wekî ku min di çavên te de damirand temenê xwe?

Dibêjime te, ha derê meydanê!
Ka dikarî bibînî evîndarekî mîna min
û serdemeke zêrîn a mîna serdema min.
Derkeve ger û geştan, dilê te çawa bixwaze, derkeve!
Bikene, bigirî, birçî be;
lê ez dizanim ku tu dê nebînî warekî nivistinê
mîna paşila min.

*31.10.2022*
*Bazîd*

**26. Ez evîndariyê dizanim, lê belê... helbestek ji Ehmed Meter**
Canikê ji paş ve gazî min kir:
*"Ez ji bendemanê mirim,*
*lêvên min qirqiçîn,*
*giyanê min çilmisî,*
*cendek pizirî,*
*li daristanên min birîn peyda bûne ku derman nabin*
*û li çolistanên min pêtên êgir peyda bûne ku emanê nadin.*
*Lo helbestvanê min!*
*Tu dê kengê çolistana min bi şewata agirekî damirînî*

*û tu dê kengê daristanên min bi teqîneke xwînî biaxivînî?*
*Min dilê xwe wekî nivînekê ji bo te amade kiriye,*
*û ji evînê rayêxek raxistiye.*
*Gelek caran ramiyame*
*û gelek caran jî êşiyame;*
*lê dibînim ku jena dilê te vingîna fîşengekê ye,*
*stranên te zûrezûr û zîwezîw in,*
*hestên te fermana kuştina min in,*
*hêvî û daxwazên te dîlên min in,*
*tu vegeriyayî ariya agirekî*
*ku jê xwelî û çend çîkebizot mane;*
*ba jî pifî vê ariyê dike*
*û li xwezayê tartarî dike.*
*Tu nizanî bê ka evîn çi ye*
*û ez badilhewa mirim li bendemanê.”*

Rehma Xwedê li dilê te bendeyê be
û ez tu lêborînê derpêş nakim!
Ez jî dizanim bê ka evîn çi ye, lê belê
di rastiyê de vîneke min tunebû;
zingezinga tofana kederê sîngê min hingaftibû,
evîn agirek bû, lê ji ber çavan winda bûbû,
evîn tavek bû, lê dema ku şevê roj pêça wê jî xwe veşartibû,
evîn beytikek bû, li ser gir û kêrtên min bi wîtewît distra,
û dema ku nêçîrvan xuya bû, ew jî firiya.
Ax, xwezila desthilatdaran
kûçik bernedana ser çermê min
û ji bo vê mebestê neketana pêşbirkê!
Ax, xwezila wan lûleyên min ên xwînê bi rûn danegirta
û neksa min bi toz û xubarê neçikanda!
Wê hingê ez ê bi helbestên xwe daketama qadê,
biketama cizbeya derwêşên xwewindakirî.
Min ê vîçevîça serê sibehê li qirikê biçikanda,
stran li dev û lêvan vegeranda,
hinehim bişanda sîngan,
li her devereke germ û sermayê agir berda keştiyan,
kevir bidana axaftin.
Min ê Îmrulqeys biavêta berîka xwe,
û Nizar Qebanî bi tevahî ji rojevê derxista.
Dizanim bê ka evîn çi ye,
lê belê evîna min
li ser bendê tamarên min daliqî ma
û di zindana dilê min de mir!
Canikê, nekeve wê gumanê ku evîna min bi xwekuştinê mir,
nekeve wê gumanê ku evîna min çiqilekî hişk bû û mêwe neda.
Canikê, nekeve wê gumanê ku ew jixwe evîneke şil û şeht bû
û heke qudûm tê de hebûya, dê bimeşiya.
Nekeve şik û gumanan,
min û evîna min bibexşîne!
Ji ber ku ez bi hêsiran jehên sazê dijenim
û gava distrêm, bi xwîn vedireşim.
Dijîm, lê kef bi devê min ketiye;

di sekerata xwe de vediçirikim
û lewre dema min nîn e ku ji bo sermestan bistrêm.
Min bibexşîne,
heke min newayên xwe damirandibin
û perdeyên xwe kişandibin.
Ji ber ku ez heme;
lê ne xwediyê dilekî kirêkirî me.

*05.11.2022*
*Bazîd*

**27. Sê helbest ji Dr. Zekiye Malullah**
**1. Cîhana te**
Dilbera min,
nîşaneyeke hestiyariyên bedew e cîhana te
û ahengeke kûrwate ye
ku di kerdiyên bostên de diparêzim.
Rûbarê Nîlê,
ew çemê sernerm ê li nava bîranînên min,
kul û derdan dimilmilîne ji çavkaniya hestên min
û derbas dibe ji peravên dirêj.
Di nava risteyên xwe de dil dibijînime te
û qurbetiya xwe ji bîr dikim bi hezkirina te.

**2. Jena dilî**
Îro dîsan bi kelecanekê hatim
û jen û terpîna dilê min tu yî.
Te hembêz dikim li kûrahiya hebûna xwe
û ji bilî bêdengiyê nizanim tu tiştî.
Çavên te hertim li asoyê ne
û hemû xemên min berhewa dikin;
maweyekê di bîra min de digerin
û hemû demên min berhev dikin.
Ew çavên ku mîna çemekî şîrogermî dikişin,
xewn û azarên min jî bi ro de dibin.
Dîsan ew çav in ku mîna xweşbêhneke efsûnî
bermayeyên xwe di paşila min de vedişêrin.
Tu dibêjî qey îro
ji dayikê bûme di çavên te de
yan jî min reng vedaye wekî darhinarekê.

**3. Evîna dîdarekê**
Dilbera min,
min çîroka xwe li jêrnîşeyên jiyanê nivîsandine
û çend bêrîkirinên xwe jî
bi helbestkî li çavên te nîgar kirine.
Stranek dibêje ku:
Heyla Misirê, lê dilbera min!
Ji te hez dikim wekî gul û çîçek xunavê hembêz dikin;
wekî ronahiyê hildiçinin reh-rîçalên xwe
û xunavê radimûsin.
Ji te hez dikim,

ji mêj ve dildarê te bûm
û hê hê jî wisan dildar im.
Li ser nexşeya dil û hinavên min
mîrgeh ava bûne
ji evîna dîdarê û helbestên evînî.
Hemû tiştên ku min çîlovîlo kirine,
çend qesîdeyên nekemilî ne;
hemû nîgareyên ku min xêz kirine,
çendek hestyarî ne
ku ji serdemên dêrîn ve ligel xwe digerînim.

*06.11.2022*
*Bazîd*

**28. Her Xwedê dizane**
Gelo tu li dûr û derezîyekê yî
û loma xaşxaşe ketiye dile min
ku te dereng bibînim.
Rast e, ha zû ha dereng em ê li hev werin
wekî ku ta û derzî li hev tên;
lê ji ber ku mezheba me evîn e,
em her du jî
ne bi arava destê şêxan dikevin cizbeyê
ne bi şerava destê feylesofan serxweş dibin
ne jî tira par havînê tînin nava şîn û nivînê.
Wihareng e, ji ber ku ez û tu
sirgûnên rastiyekê ne,
ango du aliyên evîneke bêdawî ne
û ev evîn ne tûrê li ser pişta rûto ye.

Lap 32 sal in ku li te digerim dilperatê;
her çiqas ku min û te
li Enstîtuya Zimanên Mirî yên Kurdistanê nexwendibe jî,
tu li benda peyameke min a kurmancî yî.
Ez li te digerim;
ji ber ku tu hestiyê min î parxanê yî,
dewsa te vala ye,
û birîneke nekelijî ye ev valahî.
Dizanim ku tu li benda peyameke min î;
ji ber ku çîroka me ya kurmancî ya zaroktiyê nivîşkan mabû,
ew çîroka ku digot:
*“Filan û bêvan, gur li berxikê bû mêvan, delîl li halê maka dêran...”*

Dema ku Zeûs û Deyûs li ser mêza girover rûniştin
û li ber mûsiqaya Amadeûs Mozartî dinoşiyan paşeroja me,
ez bi tenê ketim pizdanka ramanê
û bêyî hevalpiştan daketim qada jiyanê.
Loma wê hingê kevirên jorê totî jêrê dibûn
û kevirên xîmî dipengizîn jorê
digel jehr û ziqûma binerdî.
Aha wê hingê lehî
wekî siyaseteke rêzetecawizan hildipingirî nava Baxçeyê Keşîşî

û rehên daran ên hincirî rût diman ji ber hilkutana lempereyan.

Bi rastî tu wê çaxê li ku bûyî,
salnameyê kîjan zayîn û koçberî nîşan didan,
dîrokê ser û guhên kîjan bûyer û nûçeyan li hev dixistin?
Gelo ez bi helbest û pênûsa xwe dihatim bîra te
yan tu bi kenê xwe yê keserkuj,
çavên xwe yên zeytûnî
û gerdena xwe ya xwihdayî
wekî hêjîreke xweşterixî dihatî bîra min
êdî her Xwedê dizane.

*19.11.2022*
*Yenikapi, Sitembol*

**29. Bi xatirê te Xibşê!**
Bi xatirê te Xibşê,
gula govendên rengîn
û motika ciwanên bengîn;
hey gerdennermikê,
rûnê nivîşk ê li ser leganeke hingivê Miksê!
Îro li pêşberî min
koçberiyeke berî firînê derkete kifşê.
Ez ê paşxaneya xwe bispêrim dîrokê
û pêşxaneya xwe raçînim ser tevna çîrokê.
Dizanim ku tu dê bibêjî:
*"Ma min cûcika Xwedê rûçikandibû*
*ku hertim ji bo çûyînan tê yî serdana min*
*wekî ku hec û tewafa kûçikan li dora hestiyekî be."*
*"Na, na."* dibêjim *"Wisan nebêje!*
*Ez di <meqama heyranê> ya sofiyekî de me,*
*ji seydatiyê derbasî şeydatiyê bûme,*
*min hemû cînavkên navdêrê navdar ji hevokên xwe qewartine,*
*lêkerên gerguhêz li pêş negerguhêzan dewisandine,*
*paldûşên xwe yên cengî danîne rexê çemekî herikbar,*
*li gorî rêbazên tehfîrkirina necaseta siyasî destnimêjekê digirim*
*û tu jî dizanî ku ava gurr bi çelpandina seg û tajiyan naherime.*
*Bawer ke ez ji qehran naçim;*
*ma tu çawa bawer dikî*
*ku ez kurê riştexurê ji qehra miqarnexuran diçim?*
*Dîsan dibêjim, ez pîbar im û ez dê biçim delalê!*
*Di temenekî navsale de*
*ez dizanim ku ez ê çi bikim*
*wekî ku diz dizane çi ji ku diziye.*
*Ma tu bi xwe jî nizanî*
*ku paleyê çê berdane gûyê hirçê*
*û hertim bi têkçûnekê dest pê kiriye şerên me?*
*De hesêb ke*
*ez naskiriyê bi nasnavê <Br. Antîfaşo> jî diçim Miami û Hawaiyê*
*da ku çend gondolên gendelxurên me*
*li ser riya xwe deverûyî bikim li Malta û Venedîkê.*
*Hela li derî û dîwana Xwedê binêre*

*ku ez dasiyê qantirkuj jî bêteyax bûme*
*û li gunehên me yên hevpar newan bûme.*
*Hela li vegera riswatiyê binêre*
*ku ez jî zêmaran dinehwirînim li ser xezaleke xwekuştî*
*di bin bandora dîroka xwekuştineke neteweyî de!”*

Bi xatirê te Xibşê,
destmala govendên eşîrî û moçika xîretê;
hey sînghewirmişa ku ez vegerandim masiyekî bêdasî
bi eşqa pêlên zeryayî,
bi meşqa serafa dilan!

*20.11.2022*
*Sariyer, Sitembol*

**30. Hevpeyvîneke kurt bi Araratê re**
Silav Araratê, silav lana aryayiyan!
Min navê te li nava rûpelên peritî dît
ku bûyerên dîrokê kaxez hizhizandibûn;
lê dîsan jî pisporan nivîs vereşandibûn
ku navê qedîm Aryarad, ango Aryalan e.

Nizanim, ev çi hewal e?
Niha çilapekên berfê yên çîlspî
wekî parsekên bêşerm û qirêjok dora te girtiye,
mij û moran li serê te niştiye
û loma tu bi çilmaska tûranavîrûsê ketiyî
ku me berê jê re digot bapêşka moxolî.

Nizanim, ev çi pergal e?
Gelo niha helbestvanên te yên bêpişt û bêxwedî
mîna hespên serkêş
kîjan siwarê xîretê digihêjînin Kaniya Karwanan
bêyî ku gazindan rêz bikin.
Îcar çi demê ziman li ser mîrateya Bel’am b. Ba’ûrayî rûnişt,
vegeriya amraza çêjhilkirinê,
bêxem kire çelpeçelp, virçevirç û milçemilç,
-ango fenanî segekî veketî û ji xew re çûyî
ku mirov tênagihêje
dê kengê rikêwî der û cînaran bike?-
nizanim.

Hey Araratê!
Nizanim, çavên serê te yê bilind
gelo keştî û şemendiferên Sitembolê dibînin;
guhên te -yên ku havînan wîlewîla mar û mûran jî dibihîzin-
gujeguja siware û balafirên vî bajarî seh dikin vê payîzê?
Gelo bi te ve eyan e
ku hemû pisîk, seg û tûtiyên vî bajarî
têr, tîmarkirî û sorgivirî ne;
hemû rê, kolan û rûgeh
digihêjin kerxane, lotikxane û meyxaneyan;

hemû mirov
li gorî nexweşxane, dermanxane û goristanan tên dabeşkirin;
hemû raman, şirove û nîqaş
di bin sernavê xelat û celatan de
li ser zindan û koşkan tên parvekirin?

Tu bidî xatirê izeta nefsa Biroyê Heskê û rêhevalên wî,
çengek berfa xwe ya kevn jî neşînî hawariya vî bajarî
û rûmeta xwe ya çîlqerqaş
li vir nemeyînî, nelewitînî!
Ma nabînî ku ava du zeryayên qerase jî
nikare rûyê wê spî bike?

*25.11.2022*
*Yenikapi, Sitembol*

**31. Li ber wêneyê Dilmestê**
*"Dilmestê îşev rojbûna xwe pîroz kiriye*
*û wêneyekî pîrozbahiyan jî daye ser rûpela xwe ya civakî."*
digot hevaldestka wê Rûpakê
ku dê piştre bibûya hêwiya wê.
Dema ku min wêne danî pêşberî xwe,
veciniqîm ji serkêlka goreke miriyan.
Hewar, hewar!
Guhar wekî zolikên daxwazan dimilmilîn,
çav bi qasî heft erînan di kort de çûbûn xwarê,
bêfila pîrejineke tiredîn û efsûnbaz daliqîbûn ser dev û lêvan,
gerdeniya li stûyê wê mînanî kemendeke dîl û koleyan dixuya,
tiliyên wê yên lerzok bêhuzûr rawestiyabûn li ser maseyekî,
wêneyê sar ziq li mirovî dinihêrî
û lewre min ew danî aliyekî.
Min gote xwe ku ev ne Dilmest e
û ne wêneyê wê ye jî;
ji ber ku ez wê baş nas dikim:
pêşiyê min ew di zêhn û xeyala xwe de afirand,
piştre tovê kîmyaya wê ji avikeke jîr hilbijart
û di dawiyê de bi zexma ciwanegayekî efsûnî
fîzîka bavê wê hilperand
û rehma dayika wê jî
bi bîrkariya ejdehayekî tî
ew avika zindînasiyê daqurtand.
Hemû kar û bar li taldeyekî
di bin ewlehiyeke xurt de hatin parastin;
di wê tariyê de çavan çav nedidîtin,
derî û pace girtî, zirze û derabe kîp kişandî, giyan rût û cendek nixamtî bûn.
Her wiha xulexula mirovên bextreş û kêfa wan a riswa jî li derve mabûn.

Dîsan dubare dikim
û heke pêwist bike, dikarim çendbare jî bikim:
min di civateke şer û nêçîrê ya şahanî de
wêneyê wê nîgar nekiriye
ji bo stratejiyeke şahînşahiyê

û piştre ronekiriye ser qalibê ruhberekê;
ango şopa lingên dizan
û çirkeçirka diranên çavnebaran
nefizirîne nava pêkhate û keresteyê Dilmestê.
Ew rengekî serbixwe yê mirovsaziyê
û dengekî nuwaze yê kesayetsaziyê ye.
Wê li kuncikekî nepen ê Kurdistanê
wekî awireke bêguneh teşe û dirûv girtiye.
Belê, ew wekî nefeleke kesk a mêrgan hêşîn bûye
û wekî qedîfeguleke binefşî ya li ber paceyan
bi dilgeşî û kubariyeke mezin bejn avêtiye;
lewre ne mumkin e ku ev Dilmest be
an jî wêneyê wê yê kaxezî û jimarîn.

*26.11.2022*
*Kumkapi, Sitembol*

**32. Îşev were xewna min**
Bêguman evîn kinceke bê şêl û kêl e,
ango mîna kirasekî nedirûtî yê heciyan e;
dirûşmên wê yên dilsoj rengê rûyan diçilmisînin,
revebezên wê yên meydanî sîngên sermagirtî vediterisînin,
saw û sehmên wê xwedîxatiran ditirsînin
û herwiha ser û guhan li mirovî dimerisînin.
Lê belê divê ji bîr nebe
ku niqurç û hutikên li newqên heciyan
kar û barên asayî ne;
ji ber ku civana hêmayî ya li hafa Xwedê
mêrê çalak vedigerîne hedemêran
û jina jîr jî vediguhêze hedejinan.

Her çi dibe, bila bibe!
Ez ê îşev bi dua û dirozgeyan binivim;
hêvîdar im ku bi daxwazeke dilpakiyê werî xewna min
hêdîka, pêxas û li nava şevaniyeke tenik.
Fenanî çivîkeke tirsonek binişî ser çengeke min,
bi huner û şiyanên xwe yên kêmnas
min hilkişînî pêlekanên bextewariyê;
dîsan xanik û şanikên çermê xwe li min bidî jimartin
her wekî nûgihaniya xwe ya şûm û bêfesal.
Li ber ronahiya findê ya lawaz bipirpitî,
gulpegulpa dilê min vehêsinî
bi inteint, nalenal û tengenefesiyê;
ji berdêla cangiranî û teraliyê
pêl bi pêl wizeyê dagirî termê min.

Ez ê îşev bi hêvî û bendewariyan binivim.
Tu dikarî vê helbestê wekî nameyekê jî binirxînî,
derî û paceyan berk daxînî,
şerma xwe ya seyr bikî ardû
bêhedûriya min a dembihurî bikî nift
û bi wan her duyan

argûna me diljaran vêxînî.
Wê hingê tu dê bibînî
ku ez vegeriyame xortekî heweskar
û min çav berdaye rûmet û zengîniyê:
çavên min li wê rûmetê ku gulvedana destpêkê tu yî
û çavên min li wê zengîniyê ku berdewamiya sermiyanê tu yî.

Dixwazim îşev bê tirs û kawis binivim;
ma ne mafekî min ê bingehîn e?
Bila ewqasî hevrik
ji ber dengê Kawis Axayê Milanî şeytanqûnî bibin;
gava hespê min û mehîna te
bêkeder û bêkeser bigevizin
li ser peynê dîrokê.
Bila ewqasî xêrnexwaz
qulefîska rûnin li berê dîwaran bêdeng û bêbizav,
lêvên wan ên pîrotankî binikên cixareyan ramûsin,
hêsirên wan bibin rêşiyên qeşayê,
ji dev-diranan heta paniyan birikrikin
û mîna cinawirên şeytanî yên bêsîçe û pişthotik
bikin himehim û birebir;
lê ez û tu heta ber destê sibehê
wekî du heştpêyan rapelikin hev bêminet,
hev bixwin bi henek û hîkehîkan
û piştî qîqîniya dîkan
veciniqin ji cinabeteke cirxweş.

Bizanibe ku tu pirtûka min a nependî yî,
min kedeke nihênî mezaxtiye ser hesabê te yê veşartî
û ez ji vî pêşikê xwe sar nabim.
Rast e, tu li dijî guneh û xemsariyan
binkiraskên şimakirî li xwe dikî;
lê ez kurd im
û hertim xencereke şeytankuj a destîsedef
di ber şûtika xwe de digerînim.
Gava pêwist bike jî,
-bêyî dudiliyê
û bêyî piyariyê-
wê zikqelêşê dihincikînim li bîbika armancê.

Êdî te peyam wergirt, de were!
Her çiqasî zivistan sar be jî,
bila xwihdana min bibe germava te pêxasê;
înka xwe ya tenîsk pêpest bike
û ber bi kûreya navdilî were!
Ma te nebihîst?
Wisan li best û beyaran tenê nemîne
mîna şafireke heftbelgî!
Xwe li çiqilekî leylana xewnên min bipêçe
û min ji lîlavkên kawisan rizgar ke!
Were, hema îşev were!

*02.12.2022*
*Yenikapi, Sitembol*

**33. Berf dibarî li bîranînan**
Kî ji derve tê
dibêje ku hewa sar e,
lewre direve ber agirekî xweş
û bi kesên li dora êgir re
peymaneke aştiyê ya demkurt datîne;
lê belê ez di temenê pêncî saliyê de
hertim li ber agirekî xweş bûme
û hertim berf bariye ser bîranînên min
(ew bîranînên qambihust
ku bi Araratê re ketine qayişkêşana bejndirêjiyê).

Dema ku diya min
hêleçana min bi loriyan hejandiye,
xwişk û birayên min çavnebarî kiriye;
gava wê çîrokek vegotiye zarokatiya min
hemû guhdar ketine lisfê lîstikvanên nebaş
û li dijî min dek û dolab gerandine.
Herwiha çi çaxa ku bi stranekê ez hilqefşandime
û teralî ji cendekê min dawerivandiye,
hawirdora çavbeloq bi wijdaneke kevirkî li min nihêrtiye.

Carekê dîsan berf dibariya ser bîranînên min
û li ber argûna pixêriya me
şêxekî nîvewliyayî
û melayekî nîvxurifî
pesna min daye û gotiye:

*“Ew neqaşê ezel ku navê te bi Omit qelem da,*
*hêvî jê hebû ku hespê te yê lexer jî bibezanda.*

*Tevgera perperokên li dora panosên qels rawestanda*
*û ew bizav li dora wêneyê te yê findankî bicivanda.”*

Gava ku min ev dubeytî bihîstine,
bêguman ji bilî navê xwe min tiştek fêm nekiribûye;
lê piştî xwendin û gihiştinê,
hîn bûme ku wê hingê
min ji nîgareyên şer û evînê hez kiribûye.
Lewre kêf-hewesa şêx û melayî
bi tercîh û ecibandinên min re nehatibûye
û wan bi mebest
li ser kêşa raweyeke daxwaziyê ya pêknehatî
hevokên behicî saz kirine.

Xweş tê bîra min:
Havînekê
tavê hesin disincirand li cemsera min a başûrî

û li cemsera min a bakurî
berf dibariya cênikên civaknasiyê
-bêyî têqetîqeke esabî ya ewran
û bêyî henek-genekên keskesoran-.
Wê hingê ez teze zewicîbûm bi siha xwe re,
xanima min a ji devreke germ
bi kincên tenik û sivik hatibû
û pir hewes dikir ku derkeve şaneşîna seraya dilê min;
lê dîsan berf dibariya li gelî-gebezokên bîranînên min
û wê bi neçarî xwe disparte şkeft û qefên derûnînasiya min.

Ax ji kesera dilan re!
Çi heyf ku qefilî rebena Xwedê,
piştî wê dûmana dilgiranî û hêrsê;
mixabin ez
di bihara bîrkariyê de
bi mirina wê hesiyam
û heywax li min
bêyî şîn û dêlindêzeke dînî
li warê pûg û şepeyan hate çalkirin.
Di wê werza zindîbûnê ya axlêveyê de
laşê wê yê veheliyayî
li teyrên berateyan, gur û çeqelan raspart
zarokên wê yên nebûyî
mirazên wê yên qurçimî
xeyalên wê yên serserkî daliqandî
îskeîsk û nalenalên wê yên berî girînê.

Hey dilê bêwar û kevirê bêriyê windakirî!
Ez heta roja îroyîn jî neçûme serdana wê gora jiberçûyî
da ku teqereqa piyên min nezengilin guhên wê
û ji ber dengê nalçeyên nas
venecenîqe mehşera min
(Ew mehşera min a li çiyayê helbestê
taxa sererdî ya berî darbestê
jûra fireh a qatê jorîn
ku çavên jimareyan
li deriyê wê yê krîstalî neketine.).

*10-11.12.2022*
*Aksaray, Sitembol*

**34. Dema ku helbesta te dixwînim**
Erê delalê,
dibêjin ku *“wêrekî bavê afirîneriyê ye,*
*kêmasî diya şêwazê ye;*
*hişmendî û çelengî jî zarokên wan in”*.
Min jî rastiya vê gotinê ceribandiye
û ez î îşev şeveder bûm;
min hê berêvarê hespê xeyalan qeşaw kiribû
bi destên vala yên bêhuzûriyê.
Ez ê biçûma quncikên herî xewle yên bîranînan,

min ê çendek razên me yên veşartî
biavêtana terkiya xwe
û wekî fîşengeke armancgirtî
bipengiziyama xewn û hêviyên me;
erê, ez î wêrek bûm,
lê kêmasiya min tu bûyî,
şêwaza jiyana min bêyî te qalib girtibû
û ji nişkê ve ez hişyar bûbûm li rojederiyê.

Tavê çong vedabû erdnîgariyê
û li kuçeyên teng ên betûm
lehnet dibarî ser qûze û taldeyên tavnedîtî.
Çîveçîva çivîkan û qijeqija qijalkan
xurînî dianîn bîra mirovî;
çaya darçînkirî û kakilên gûzan ên li nava reçela gulan
destên te yên tîştîşî ramûsabûn.
Ez î çiqasî bextewar bûm:
hê di roja roj de serê min gihiştibû ewran
û di wê rewşa xwe ya çiksayî de
bi dîdara te aşt û xilmaş bûbûm.
Bêhna têkel a zencefîl û qurnefîlê taştêya li hêwanê dianî bîra min;
bêhna germixî ya cehterî, pûng, zehferan û bîbera tehl mizgîn bûn
ji bo firavîna li binê sîwanderê yan jî şîva li şaneşînê.
Piştî her xwarinê ez noqî nava pirtûkan dibûm:
nûçeyên serok û artêşan,
pêşangehên çek û cebirxaneyan,
zêrezêra dîrokê ya li ser dîlên şeran,
bûyerên talan û vegirtinên deveran dadiliqîn rûpelan;
te jî geh bi sîx û tîxeyên hûnanê moçikên xwe radiçandin paşerojê
geh bi kerkît û xiştikên tevnkariyê çîrok û destanên gelê me vedijandin pêşerojê.

Nîvrokan
tavê xwe dida zikê esmên
û gef li rehek û ruhberan dixwar;
îcar ez difikirîm
bê ka tovên çêreyê çiqasî bêhiş in,
xweliya li ser qalikên xwe
bi înk û rikeberiyeke nedîtî-nebîna diqelêşin
û xwe ber bi tîna wê tavê dikêşin;
lê gava eynî tav
li ser qîrê diqijirîne hêkeke xav,
ew tovên hûrbijar
xwe dispêrin sîberan
û di qelîştekên xewle de
pelçimên hedûreke nepen diparêzin.

Erê delalê!
Erê, tûtiya qefesê ya ku welatê wê ez im!
Niha ez jî mîna rehekeke bêhiş li xaneke xewle me
û di nava keftelefta xebatê de ji gefa tavîniyê ewle me;
lê xandarekî bextreş vepeliyaye ber kuskiyekî şeravê,
diz û keleşên ji sêdaran reviyayî jî

li jûr û hêwanên vê xanê birçêk dilîzin
mîna Elî Baba û Çil Dizî.
Ez ê bi destî kê
peyam an jî nameyekê
ji te re bişînim?
Bizanibe ku li vê wêrtasê
wijdan çiyayekî riprût e
û zindî xwe lê nagirin;
qareqara firoşkaran û mizemiza kiriyaran
mirovî canzerî û navkutî dikin.
Rêzgirtin, heyranî û hezkirin
tenê hêjayî serê pîvazeke genî ne
li gorî rayîşa pergala pûlperest.
Di nava kel û pelên qereçiyan de peyda nabin
destmalên sergovendiyan û misk-emberên heciyan;
her çi ku namûs e,
termekî li ser teneşîrê raxistî ye
û kelenimêjekî mirîşo
-bêhayî şîndaran-
ravranên riswa û lewitî
bi xortimeke avşidandî tehfîr dike.

Dîsan ji nişkê ve
-erê delalê, bawer ke ku dîsan ji nişkê ve-
qerepereyê te
tê ber çavên min;
nîşanên dev û dêm û kenê te
bi qasî maweya ramûsaneke xêrhatinê
xuya û winda dibin,
çengên te yên berxwedêr sist dibin li pêşberî min
û buxçikê te yê xwarina paleyê xîretê
ji nava tiliyan dişimite ber siya partekê.
Tu çima çik li piyan mayî?
De rûne pêşberî min,
li bîbikên çavan temas bigire
pariyên gepan û bermayeya tasê nejmêre.
Piştî xwarinê
dema ku helbesta te dixwînim,
bibe xwîneke hênik
û li nava rehçik û lûlexwînên min bigere.

*28.12.2022*
*Yenikapi, Sitembol*

**35. Bi helbesta zikmakî min vejîne û rojane bike!**
Ez helbesteke zikmakî bûm li ser zar û zimanê te,
rûyê min ê neperitî bi pesn û pertafan
wekî pûga ber tavê diçilvilî;
berî ku bizanibim
ew avahiya dorgirtî ya li kêleka mala me
dibistaneke biyaniyan e,
bindestiya mirovî sermedî dike

û ji bo armancên dagirkeran
giyanan kedî dike.
Roja ku min gav avête baxçeyê wê dibistanê,
dest pê kir berpirsiyarî û qedexeyan;
bi destkarî û xelboqeyan qalibê min rokir
mêrkujekî bêxew û bêhuzûr.
Ew qiraskê seriyan
di dilqê zimankujekî de dixingilî
û ji bilî alfabeya zimanê ferzkirî
hemû deng huş dikirin;
lewre bêdengiyeke wisan dirêj û dijwar
wekî teyrê berateyan
daqulî ser Guhera Şêx Resûlî
û dara strana “Miho”yê koçberkirî
ji Rewanê kok berda Erezî.

Wê dibistanê
-bi rastî wî aşê mirovxur-
pêşiya pêşîn navê min pelixand
û nûçikek bi min ve girêda;
bi wan nav û nûçikan
şan û şiyana min şkestin,
ez vegeriyam veqetandekeke rûpelan
û wekî peleke qurnefîlan a çilmisî
ketim nav beraşên pirtûkên biyanî.
Xwendekarên hêrshatî, bextreş û bêhedûr
radihişt dizgîna peyv û hevokan,
rûpel werdigerandin,
şûna min diguhart her carê
û maweya sirgûnê dirêj dikir li min;
jimareyên li çimeke rûpelan
her çiqasî mezin û têkel dibûn
ez ewqasî ji xwe û te dûr diketim,
ewqasî ji hêlîn û malbata xwe dişehitîm,
ewqasî li gund û taxa xwe kovî dibûm,
ewqasî li civak û welatê xwe havî dibûm
û bi hesteke harane
ji çem û rûbarên xweşûştinê disilikîm.

Wî aşê serxur
ji berdêla hiş û xîreta lelê
mêjiyê mirîşkeke makîneyê çikiland
li qaqotkê min î kurkirî ji hestan
bi destî mamosteyên rengjen
û bi destikê rastkêşên cemawerî;
roja ku bizotên êrgûn ji çavên te teyisîn,
nêrînên gefxur û awirên tûj li min peyda bûn.
Lewre ez û tu
bi nerazîtiya dilan,
bi berteka ziman û rûçikan,
bi hêza dest û piyan
ji wî aşî raqetiyan

û li Zozana Şêresiyarê rastî hev hatin.
Piştî hilgêr û dagêra zozanê,
dîsan mal melisîn aranê;
lê çi heyf ku li hev nehat sozê bindarûkê
û ez venegeriyam bin dara sêvê ya li ser riya goristanê.
Ji ber ku pêşniyareke genefiskî
ez ajotim giranî û toza bajêr
bêyî ku bizanibim
tenê bi mêvanî
êdî ez ê bihatama gera gund û waran.

Nizanim tu çend rojan ponijiyî
û te çendîn salan raçav kir vegera min?
Lê baş dizanim ku civatên tozkêşan
kar sparte komên barkêşan;
wan jî her roj hiş û mêjiyê min saxtî kirin,
kelecan û tevgera min tevizandin,
xeyalên min şane bi şane vegevizandin,
rengên navsivikî û xemgîniyê li tevna min raçandin
û di encamê de
deng û rûçikê te ji min heyibandin.

Heke îro dîsan vegeriyabim helbestê,
sedem tu yî;
herwiha mebest tu bûyî,
heke duh bi bendê hêviyê hilkişiyabim Hêsiya Qelenderiyan
û rizgar bûbim ji Sarinca Ebês û Bîra Sufyaniyan.
A ku ez nivandim xewa mirinê,
geh çavnebariya xwişk û birayan bû
geh çalima heval û hogiran bû;
lê -heke bi duristî gotin bê gerandin-
a ku ez vejandim
û bi pergala jiyanê rojane kirim,
jinxasiya te bû,
nemaze ew çenebaziya te ya kurmancî bû Şehrezadê.
Tu bidî xatirê Xwedê!
Tu çiqasî li ber serê min rûniştî,
te kîjan xweşbûyera me lorand,
te çend kulm rondik rijandin ser porê min
û te çend caran eniya min ramûsa
ku ewqasî zexm teqiyam,
mînanî Germavên Gihadînê germ kişiyam
û fenanî kaniyeke binerdî ya Misûnê
pijiqîm nav dîwana camêr û canikan?

*08.01.2023*
*Lalelî, Sitembol*

**36. Îro yekşem e, ez hûr û xaşe me**
Duh şemî bû;
tevahiya karmendên fermî veleziyan xewa şirîn
û piraniya karkeran jî nîv rojî xebitîn.

Kar û ziyanên karsazan
bi destî firoşkarên zimanbaz
û jimaryarên destefsûnî hatin berhevkirin;
lê ked û destmizên xebatkaran
bi masûlkeyên rakişiyayî
û mirûzên tirş li dosyeyan hatin tomarkirin.

Sibehê duşem e,
dem û dezgeh vekirî ne;
wekî ku taya mirinê cendêk digijgijîne,
wekî ku bêhna xwîn, barût û şewatê
Rojhilata Navîn li ser daxwarinê diamojîne,
her kesê berpirsiyar û neçar
dê bilezîne karekî:
êdî karo tu qenc bî,
êdî karo tu renc bî.

Her çawan ku we fehm kir efendîno,
îro yekşem e
û nizanim gelo betlaneya fileh an jî cihûyan e;
herwiha nizanim gelo hexam û keşîşan
bi xêr û bexşîşan
gunehên paşvemayî veşûştin ji dîrokê
û xeyalên pêşveçûyî malaştin ji derew û pertafan.
Îro yekşem e
û ji bo misilmanan giştî
roja duyem a piştî betlaneya înê ye;
ango roja xebat û lebatê ye,
li ser rawêjkariyên nimêjê hengameya tebatê ye.
Îcar gelo şêx û melayan
ins û cin û efrîtên serhildayî tepeser kirin,
li ber ronahiya find û çirayan
gelo dabelihîn ser rehleyên Quranê
û li qada mirovahiyê
dengên dil-hinavên bêhuzûr aşt kirin bi dadweriyê?
Îro yekşem e û bi gumaneke mafdar dipirsim:
Gelo ji bo elewî û şieyan
tê çi wateyê ev roj
û jidayikbûn an jî şîna kîjan îmamî rastî îroyê tê
ku mixabin ji Kûfeyê heta Meşhedê
serê her gav û gazekê
serê neviyekî Pêxemberê Îslamê veşartî ye
wekî ku dizanim?

Her wisan ku ezê fehmkor pê hesiyam:
îro yekşem e, ez hûr û xaşe me
û li bajarekî kordunde temaşe me
ku naşibihe welatê me;
peyarêyên peritî ji hatin û çûyînan
vekişiyane bêhnvedaneke yekrojî ya tehmsarkî.
Kolanên berfîn ên Qersa qerisî,
bihurên ciqnaqî yên Bazîda Elî Baba û Çil Dizî,

hevraz-berjêrên qeşagirtî û şimşad ên Bedlîsa çilkezî
li vir nayên zanîn û naskirin.
Bi kurtî û kurmancî
mirov ji ber hişkesermayê
hêkên hesinî nakin li vê derê;
herwiha pisîkên ji serbanan banzdayî
nacemidin li hewayê
wekî ku Ewliya Çelebiyî sêwirandiye Erzerom.
Tiştê herî balkêş ê li vir:
rojên yekşeman
lep û çîpên mirovan
teraltir in ji dil û mêjiyên wan,
duristiya heyî encameke tirsa kawikan e,
dozdar jî sozdar jî bi xeyalên beredayî dibilin.

*15.01.2023*
*Kumkapi, Sitembol*

**37. Hawar ji destê xwedagirkirinê!**
*"Dilê te ne taseke tehtevêlkî ye*
*ku şilahiyan birijîne û dêrz bike."*
digot çûra çavmest;
lewre min dilê xwe ji qutiya kevnekotik derxist
û radestî paçika wê ya xam kir bê pirs û tirs.

*"Kerxaneyên biyanî pê nehesiyane*
*ku mêjiyê te çiqasî jîr*
*û hişê te çiqasî zelal e;*
*lewre heta niha hişmendiya te*
*bi gêziyeke karebayî nehatiye kaşkirin*
*ber bi gilêşdanka navendî ve."*
digot qerqaşa pakîze;
lewre min çendek razên xwe li bîra wê veşartin.

*"Bila ewkê te xweş be,*
*bila dinya bi erdê re kaş be!"*
digot reşika porşirik;
lewre min birek fantaziyên kamasutrayî pê re derbaskirin.

*"Ez heyrana sertilkên te yên li qelemê geriyayî!*
*Bi qasî gotineke jidil a qenc*
*binivîse li ser lêvên min*
*ramûsaneke çêjxweş."*
digot lêvheyvika destmerd
û çavên xwe digirtin ji şerm û kerban;
lewre carinan diheyibim bêwext
û ji mêweyên erdnîgariya wê wizeyê dadigirim.

Ji kê re çi
min dilê xwe berdabe paşila çûra hemis,
mêjiyê xwe rapê kiribe cem qerqaşa destpêneketî
mêraniya xwe sepandibe ser reşika lêvdoran û porşirik,

dev û lêvên xwe nîgar kiribin
li ser serdanpêya lêvzirava merda keça merdan?
Ez im, xwe dagir dikim
û pareve dikim di navbera hezkiriyên xwe de,
ji kê re çi?
Ev felsefeya min e
ku bi vîn û bijardeya xwe
parparî dikim xwe.
Jixwe ne karê her mêrî ye ku bişibihe min
û nexwe her kesek nikare wisan bike jî.
Welhasil xwedagirkirin renc û qolinc e,
bi dil û mêjiyê zindî re digunce;
lewre ne mirîhez e,
û li bendê namîne ku stêrkek pêşwext bixurice.

Hawar ji destê xwedagirkirinê!
Dibêjin ku xew û mirin yek in;
lewre divê xwe bigihînim dara mirazan
berî ku razên Girê Mirazan
li raya giştî bên eşkerekirin.
Jixwerazî û jiwêrazî me wê çaxê
û awirên pirsnîşan winda dibin
mîna bextewariya zarokekî bi delaliyê mezinbûyî.
Aha wê hingê yekîtiya bedenî peyda dibe
bi qijeqija endamên şewitî,
bi deng û bangên çîzçîzokî li nava kûreya êgir.

Hawar ji bextê xwedagirkirinê!
Xan û koşkên zengînî û desthilatdariyê
li pêşberî evînên efsaneyî yên nedîtî û nebîna
li hemberî lavahiyên bêpayan ên du evîndarên diljar
hîç û pûç in, hîç û pûç.
Lewre êdî bi rûyê zerhimî yê gefan natirsim,
û li ser qerf û henekên bêjiyên sergoyan napokinim.

Hawar ji tevzî û birûskên xwedagirkirinê!
Çi çaxa ku pênûs hûnaka helbestekê digizgizîne,
ez dibim kefendizê xwe,
çembera reş a li dora navê xwe
peymale dikim bi dest û pesta xwe
û layiqî cidiyeta mirinê
vedireşînim şûtika nava xwe;
ditengijim ji xaniyên xilxilî,
henekan nakim bi çûyînê
û dibirijim li kûreya evînê.
Ma ne mafê min e ku xwe dagir bikim:
berî ku hemalên rewtan min bidin ser darbestekê,
berî ku termê min raxînin li naverasta gorekê,
û ji haveynê bêhn û berateyên min
hevîrtirşekî biavêjin nava zêmarekê.

*29.01.2023*

*Fatih, Sitembol*

**38. Hey dewranê, tu herî û qe venegerî!**

Dibe ku navê gundê min Noreşînê
neketibe deftera mişkên bêşerm û birçî
û nehatibe kişandin li dîwana nexşekarên naskirî;
lê hertim di bîra min de ye,
her kuçeyeke wî ya derteng
mînanî labîrentên cinan
riyekê radibihure ber derê xaniyekî,
piraniya baxçeyên malan
bi dîwarên kevirîn hatine rapêçan
û li gorî pîvanên ciwaniyê yên cîhanê
hemû mal û baxçeyên wî
dikevin rêza kox û kolikan.

Gava dîroka Noreşînê dipijiqe çavên min
li nava bûyerên qewimî cit dibe hişê min
û demildest ji xwe dipirsim:
*"Ka serdema zêrîn a Qelenderê Nêço*
*ku teyr û tilûrên esmanan*
*mîna bûkên teze şermînga difirîn*
*û mar û mûrên rûkalê erdê*
*mîna ewrên havînî nermînga difizirîn*
(ji heybeta wî)*?"*

Îcar neviyên wî çima neşopand riya wî ya mêrxasiyê?
Çima wan nifşên peyhatî
xwe spart sernermî, bêhêvîtî û dexesiyê?
Çima ew zuriyet
ji hev tarovaro bû bi hestên tawanbarî û poşmaniyê?
Bêguman bersiva van pirsan
razeke arşîvên dagirkeran û hevalbendan e
ku li kuncikê herî bêexlaq ê rêziknameyê hatiye veşartin.

Niha yadgara bav û kalên min
di nava xwîn û jana salên bihurtî de dinale,
li serê her buhisteke aqara gund
nûçeyeke neheqiyê û encameke ehmeqiyê dikeve;
lê ez î dilrehetim,
ketime ser şopa pirtûkên vejandî
û ber bi zimanekî bezandî
hespê xwe orxe dikim
bi gavên lezandî.
Lewre ji aliyekî ve helbest gazî min dike
û li milê din lêkolînên encamdûr
xêliyên zegerekî vedikin li pêş min.

Êdî ez î ji wî gundî dûr im bi mesafeyan;
lê best-beyarên wî dadiliqin xewnên min
mîna çiqilê dareke zerdalûyan,
hemû xemên min vediguherin mizgîniyan

û şeytan hêrsa xwe dide der
bi kûstekûsta pîresegekî lewitî yî gurî.

*05.02.2023*
*Aksaray, Sitembol*

**39. Hînbûn pêvajoya rêwîtiyekê ye**
Gava mirov hînî alfabeyekê dibe,
tenê fêrî çend tîpan û şêwazekî xwendinê nabe;
lê di rastiyê de
pêvajoyeke rêwîtiyê li pêşberî wî vedibe.
Her wiha mentiqa nihênî ya li pişt bîrkariyê
sazûmaneke qepeçekirî saz dike
bi riya sifirek, neh jimare û çendîn hêmayên fêrkariyê.

*05.02.2023*
*Aksaray, Sitembol*

**40. Şeva îşevîn çito dem û dewran e gidî!**
Niha payê pir ê şevê bihuriye
û helbest nahêle
ku li nivînan biêwirim;
hesteke axaftinê û pêleke nivîsandinê
geh min li evînê sor dikin
û kela girînê li min radikin
geh min li welatekî biyanî mişexte dikin
û belgeyên penaberiya min binevat dikin.
Çiqasî seyr e ku her du jî
-ango axaftin û nivîsandin-
di navbera pisîkên dilrehet û segên bêhuzûr de
hedûra pêxemberekî li dilê min ê qilqilok bar dikin.

Çend kêlî û çirkeyên din jî dibihurin ji nîvê şevê;
îcar enîşkekê dide newqa min a vala û bangî min dike
ew cinê ji hundirê şûşeyeke dûvdirêjk û devteng filitî,
-ango cixareyeke tehlijî ji qutiyan-
dicehdine ku min dagerîne kokimekî pîs î rûqermiçî.
Ez xerîbdostê zendemayî zû dicixirim
û nizanim çima
didim pey vî bavşeytanê kol î qol î qîlse yî nenûkdirêj;
lê piştî çend bêhnefişkan
cixareya sotî digihînim xeta sor a binikê
û demildest vedigerim kaxez û pênûsê
wekî ku dozdarê hozê sexbêriyê dike
li şehrega xîretê û çarçoveya namûsê.

Şeva îşevîn çito dem û dewran e gidî?
Kurmê evînê xwe dispêre daxwazeke hişbir
û di bin nîrê bengîtî û şehwetê de
katara stûyê min kul dike;
lê hêjayî rêzgirtinê ye
ku keçên sîçezirav, tengenimî û lêvbinefşî

ji rûsariya min naxeyidin îşev,
ranaxin gewlazên gilî-gazindan
li pêş sivderê,
li ser bendê hewşê
an jî li ser çiqilê darê.

Bi vê arxweyîniyê
ez ji textê peyv û biwêjên jiyanê dadikevim,
di sedrenca eşqê de kişmat dibim
û wekî penaxwazê hevok û rêzebendan
xwe dispêrim pexşanê;
lê baş dizanim ku berê tevgera cîhanê
ne li Ke’beya Mişeref e
ku vê berbanga zîz
her miezinekî li şerefeya minareyê
ji dil û baweriyê gazî Xwedê bike.

*05.02.2023*
*Aksaray, Sitembol*

**41. Keko, tu dizanî xem çi ye!**
*-ji bo Mistefa Aydogan, nivîskarê <Xemname>yê-*

Min hê nexwendiye pirtûka te
û nizanim te
çawan êş û xem şirove kiriye;
lê dixwazim ji hebana xwe
çend derd û kulan zêde bikim li zanyariyên te:
Xem û xew ji heman rehê ne li gorî rîşenasiyê
û *“xew hem serbir e hem rizqbir e”* pêşiyan gotiye;
lê teqez xem celadekî şkencekar e,
bêterpeterp dilivlive
û bêkuxtekuxt hildikişe sîngan.
Di destpêkê de xwe digihîne dêşa dilan;
fenanî şagirt û berdestekî dikeve wê derwêşxaneyê,
lê bi huner û hostatiyeke hûrbijartî
dest û piyên xwe yên kone digerîne,
li ser postê Şêxê Ekber Ibn Erebiyî rûdine,
dibijine reh-rîşeyên herî xeternak û qedexe,
û bi awaz û şêwazê Baba Tahirî dubeytiyan dihûne.
Gava xem dibane tevgerên giyanî yên nependî,
êdî mînanî şîrêzeke erebî
radiwestîne leqînê
û dihimhime bi telqînê.

Di gava duyem de xem
kemînan datîne ser riyên bextewarî û aramiyê;
nefsên neksçikiyayî û vînsist
hînî radestbûna ziletê û mikurhatina izetê dike
her wekî ku cerdevan
keriyekî pezê diziyê diajo şkefteke sertewandinê.

Di dawiya dem û dewranê de
xem dibe ejdehayekî qerase
û li ser textê Dehakî dinişe;
lê ji nişkê ve wijdana Kawayî hişyar dibe
û ji temtêla ferzkirî diêşe.
A wê çaxê hêsir û zûkezûka dayikan
qeyd û bendên sitemê dikojin, dikeritînin;
aha wê hingê gola merhemetê zipziwa dibe,
aha wê hingê fişareke xurt qaqa reş diqelêşe,
aha wê hingê kakilê hêviyê ji cerxeya qelişî zîl dide
û êdî bi heyfa ajeroyên sêwî dipesine <Xemname>ya te.

*05.02.2023*
*Aksaray, Sitembol*

**42. Roj qefilî şeva bêdengiyê**
Şeva îşevîn çiqasî sar bû!
Bi texmîna min
pêşiyê stêrk ji sermaya bêsilaviyê qir bûn;
loma stêrka bakurî hêsir dibarandin ser heyvê,
lê ji heyveronê re çend roj mabûn
û hemû gerestêrk deyndarên tavê bûn.

Şeva îşevîn
rengê rojavayê Çemê Ferêt şaristaniyeke zepzer bû
û stêrka bakûrî ya tektenê
li bereka heyştan a esmên
mîna qendîla sofiyekî dipirpitî li ber vizikên êrişkar.
Hinekan digot ku taveke bîst û yek pencikî
dê raweşe zikê esmanê hêşîn;
lê di rastiyê de
li serayeke sêqatî ya başûrê Çemê Dijleyê
hamburgerên rojperestan ên King Burgerê dihatin pehtin:
hebikên tavê li nava mayoneza çilsipî dihatin qijirandin,
tîkeyek goştê dewaran bi salçeyê sipsorkirî li serê
û bexdenûseke kepkesk li binî.

Di çarêka pêşîn a sêmehên pîroz de,
di navbera îmsak û tekbîrên berbangê de,
her du çiyayên Agiriyê bûbûn mertalekî xwezayî
û fenanî çepereke serhildêrên Mixtepeyê
vedişart nîvê tavê yî jêrîn bi siha xwe ya suriştî,
lê nîvê jorîn çavên xwe difirikandin li nexweşiyeke navneteweyî.
Gelo Mûsa Pêxember dê hilkişiyaba ser Tûrî Sînayî
û daxwaza teceliyê kiriba ji Xwedayî
ku hejekeke kor rabe li naverasta Kurdistanê
û binevat bike çendîn erseyên kurdan ji ser nexşeya cîhanê?
Şeva yekşemê ya ku wergeriya sibeha duşemê,
Wêlewêla şîn û giriyan hilfiriya rojevê;
biyaniyên dereke yên ku zimanê kurdan nedizanî
ji paytexta pisîkên xwealês nûçe li ser nûçeyê radigihandin:
*“li sedan gund û bajarên kurdan erd hejiya,*

*kêra bêdewletiyê li newqa Kurdistanê ket*
*û neksa hejmareke nefsên bêxwedî heta hetayê çikiya”*.
Gava zerekiyên tavê ji esmanê çiksayî raweşiyan ser erdê birîndar,
nexşeya Sykes-Picotî dikeniya
bi bêşermiya matoşqeyeke bêfiljêkirî û qûndaxkirî
bi bêwijdaniya bavkujekî înkdar û heyfstandî.

Erdhej çawan rûnişt
li ser destexana kurdên bêdewlet,
kirin balûle ew mexlûqat gişt
û ziwa ziwa gemirandin bi niyeta paşîvê?
Dilopên tarîbanê çawan hejijîn,
dêw û pelîdên binerdî çima girnijîn
û çend cendekên xewaran mîna kulîlkên sor bişkivîn?
Helbet bersiva van pirsên han ewqasî ne dijwar e:
Ji ber ku pisîka feraqalês a saxfilitî ji poşmanî û tawanbariyan
hemû dîmenên mêvanê şermê tomar kiribûn
li ser alaveke sîsmîk a odeya kozmîk.

Wê sibeha bêyom a duşemê
min jî strana *“Lo şivano”* belav kir li nava kurdan
da ku serek û serwerên wan
kelefe û wêraneyên hilweşiyayî zîvalzîvalî bikin,
bi baldarî nefs û nefesên mirovan hilkin,
bêhna jiyanê ya li binê kavilan bişopînin,
şîş û betonê bi xîreta mişkê bêhêvî bikojin,
zindî û birîndaran bi xemsariyê nekujin;
lê dibînim ku mixabin
keleşên bejoderyayî yên bextreş
bobelat vegerandiye bazareke reş.
Tu dibêjî qey cejna qurbanê ye;
kesine nenas
bi destine kone
totik û çîçik-vîçikan qûç dikin li devê kolanan
û xêran direşînin ber mezelên bêkêl,
ango xanûmanên ku vegeriyane goristanê.

Heywax li min hey!
Zarokên Bazarçûkê dipirsî:
*“Lo bavo, lê dayê ma we nedigot*
*ku rengê berfê yê qerqaş jiyan jê difûre;*
*de ka bibêjin*
*çima em bi reng û pejna zivistanê diqefilin,*
*ma bêdewletî ne yeksanî bêkesiyê ye li gorî bîrkariyê?”*

Heywax li min hey!
Semsûriyek dinaliya û dinehwirî:
*“Gelî kalik û pîrikan,*
*ma we hînî me nedikir*
*ku şerê danê sibehê çêtir e ji xêra danê êvarê;*
*de ka min qanî bikin*
*ma şêniyên van bajaran*

*çûn kîjan şerê rûmetê*
*ku termên şervanan*
*bi leza birûskê hatin çalkirin*
*li çolistana şehîdên bêsexbêriyê?"*

Heywax li min hey helbestvanê rêza paşîn !
Ez ê çûxê herî erzan ê kîjan derwêş û dîwaneyî li xwe kim;
ez ê çend şîrmaqan li pelegoşa bêdengiyê xim
ku cîhana qaşo maqûlan
bigihêje hawara wijdan û mirovahiyê
û gavên sivik ên çelengiyê
nehêle ji bo êvara dûmahiyê?

*06-12.02.2023*
*Yenikapi, Sitembol*

**43. Heft pêlikên evînê**
Li gorî hinekan evîn
ne hevpeyvîneke giyanên evra ye;
lê kewtîneke bêyom a ligel saw û şermê ye,
her wisan hevdîtina laşên rût û tazî ye.

Hêjayî gotinê ye ku min evîn wisan nas nekir
û dewsa wê bi destî mamosteyeke eşqê sererast kir.
Wê dildarê pêngava pêşîn wiha ravayî min kir:
*"bêbergind û tenê ji bo zindîhiştina dilê xwe hez bike"*.

Di pêngava duyem de wê dilnazikê
giriyê jidil nîşanî min da
û gotineke pîvandî lê zêde kir:
*"çavên şil û xemgîn,*
*ango çilpeçilpa dilopên gindirî ser hinarikan*
*berate û nîşaneyên dilekî narîn in*
*ku tenê xasmêrekî dilsoz dikare*
*li wan per û baskan siwar bibe,*
*hevxem û pardilekê jî biavêje terkiya xwe"*.

Di pêngava sêyem de wê pîşekarê
pîrhevokek hilpekande tasa çavê min ê rastê
ku tevneke tenik hilçine;
lê êdî destûr neda wê yekê
ku her çar çavên me ji hev veqetin.
Ez têgihiştim ku firêta tevna evînê
li ser pêwendiyên hesas tê daxistin.

Di pêngava çarem de wê derdfiroşê
wijdan û hedûra min tesele kir;
piştre bi qasî sermayeya wijdanê
û bi qeysa berdewamiya hedûrê
kuleke bêderman li min peyda kir.
Bi vî awayî
wê hem ez birîndar kirim

hem jî xwê rijande ser birîna min a axivî.
Lewre êdî stûxwar im li pêşberî wijdanê
û dîwarê hedûrê xurt dikim li dijî niç û viçên jiyanê.

Di pêngava pêncem de wê çaresazê
kira xwe kiranî kir, lê jê poşman bû;
bawerî û berxwadana min dît
û ji karîna min hêvîdar bû.
Loma ez li ser hekîmên bijarte gerandim
û di dawiyê de ez birim cem dermansazekê;
wê pispora rojdîtî jî çareyek nivîsî li ser rênimayekê,
lê bi xweşbextiyê
derdfiroşê sond xwar ku heqdesta iksîrê ji kîsê wê be,
merhem jî berhema keda destê wê be.
Heke şaş nebim,
navê iksîrê Rewa bû
û li ser merhemê jî Perwa dinivîsî.
Ji wê mêjûyê pê ve
min rojê sê danan
û bi zikê birçî
qurtek ji wê iksîrê vexwariye;
her wiha loqek merhem kişandiye ser devê birînê;
lewre îroj miroj e û her gav du gav e,
radiwestim li hemberî bêwijdaniyê bi têkoşîneke rewa
û bêhntengiyeke pêxemberî nîşan didim li reftarên bêperwa.

Di pêngava şeşem de wê rênasê jî
dil bijande evînê,
bexşîş rijandin ser girînê,
çav berda kebînê
û bû hevderd û hevpara kul û keserên min;
lewre ez şandim cem melayekî
da ku kebîneke rewa bibirim
da ku perwayeke rast bidêrim
da ku digel wê bi kenekî bibişirim.
Ne hêjayî serê pîvazeke genî ye ku vebêjim;
lê ji bo Xwedê û dîrokê dibêjim:
melayî ji bo hînkirina herfekê
ez gerew girtim bi maweya çil salî
bi bihaneya qewlekî Îmam Elî.
Sipasî ji şabaşa Xwedê re
ku rastî peyreweke Îmam Cehferê Sadiq hatim
li hucreya yekkesî ya çilexaneyekê;
wê ji nû ve şirove kir qewlê navbihurî,
rojane kir agehiyên dembihurî
û ez rizgar kirim ji xewa xefletekê.

Di pêngava heftem de wê dildarê
dil dewisand miqabilî dil,
dawerivand ji pêsîra min derd û kul;
wekî mizgînî peymaneke terzê cehferî gerand
wekî qelendê diyarkirî tenê sêveke mêxikrêj ragihand.

Ne badilhewa ye ku evîndara min îro li rex min rûniştiye
û bi gewriyeke zepziwa ramûsaneke şilav ji min xwestiye.

Bibexşînin ku êdî vizîna bayî dibihîzin guhên me her duyan,
kulfikên bêfilên me hildikin bêhna rîçala turuncan,
çavên me tenê deliyane çakî û çaksaziyan,
û dilên me gihiştine aramiya sofiyan;
bi reşekurmanciya kurdekî negeriyayî
bi bekareta raz û emaneteke nediriyayî
ji lepên kawisê tenahiyê rizgar bûne em,
li hev aliyane em
mînanî du nexên tayekî
li ser teşiya têşîrêsa bîranînan.
Na, na, fenanî cotek marên hevgez,
yek mêgez û yek nêrgez.
Geh ew dibêje "lo mîro",
û ez mîrkutekî radihêjim cûniyî;
geh ez lê vedigerînim "ha canê"
û ew kulmek av direşîne li dehnên hilkutayî
-ji wê ava ku bi qumaşekî paqij û tenik parzinandî-.

Di wê cîhana nipnû de
ew vegeriyaye masîpankeke binê zeryayê
û ez nêçîrvanê perwazdar ê li jora bej û deryayê
divê tîrên efsûnî yên tîrdanka xwe
beytu nereşînim armancê
û badilhewa dêrz nekim.
Êdî giyanên me hev nas kiriye,
bi hev aşt bûne û biliyane;
loma em rawestiyane ji axaftinê,
diterikînin wargeh û penagehên pişaftinê,
qerepere û qirtevirtan nabînin hêjayî nirxandinê.
Sipasî ji bo hostayê firçeya narîn
ku cendekên mirovan afirandine bi vê temtêl û qewareyê.
Pa û pesn ji bo hostayê evînê
ku giyanên me hêvosandine li ser dengeya hevheziyê.

*14.02.2023*
*Yenikapi, Sitembol*

**44. Çar helbestên hilawistî li jûra Gulnîgarê**
**1. Pênûs şehitî û navê te eşkere bû**
Tu jî dibînî ku çavên min sûcekî vedişêrin,
lêvên min bêyî hemdê helbestvanekî diricifin
û sîçeyê min î rakişiyayî
tawanbarî û biyanîtiya min didin destên te yên nazik;
lê ez ê bi temkîn û ihtiyata bêwarekî
nekevim her dilq û tek xeysetî,
-berovajî gumana mêrkujekî bêbawerî-
qalibekî min heye
ku hemû çem û rûbarên Kurdistanê
dikarin tê re bibihurin, biherikin, hilpingirin.

Ez ê wiha nîveşkere dest pê kim:
Tu jî dizanî ku evîna xurt û êşa wê ya tund
mirovî li tenêtiyê asê dikin,
her wisan dilşadiya tekane û hejarî jî
du bihaneyên tenêtiya min in.
Carek ji caran,
min tîpa pêşîn a navê te kolabû
li ser palgeha wê parka ku em dicivandin;
lê jinên navmale yên xurifî
bi bîs û raza me hesiyan
û qerfên jiyaneke şepirze li pey me xistin.
Sipasî ji bo Xwedê
ku te ez rizgar kirim ji vê şermezariyê,
te bi rêbazên nû û nenas,
bi hunera qelema neqaşekî heweskar
ew tîpa alfabeyê guhaste wêneyê şahmarekî.

Piştre hesta helbestvaniyê ez quraftim
û stewîna hunerê ez ji lêkolînan kesaxtim;
lewre min rahişte hevsarê hespekî tewleya mîranî,
bi pîşeyê hespzanekî cendekê wî qeşaw kir,
bi tevgera destekî lezgîn devgemek lê şidand û zîn kir,
tofana tasewasan avête terkiya xwe
û qemçikek ji bayê hewesan rakişande binzika vî hespê boz.
Ne ez tenê,
bi hemahengiya hemû sazbendên bijarte
û bi newayên hemû meqamên resen
em helbestvan vegeriyan siwarên çeleng;
hespên me dibeziyan dîrokê
ji çal-kortalên wê nediwestiyan,
ji rûpelên wê yên zerotankî dipekiyan,
bi destsivikiya mêrkujekî dilreq çarçove diçirandin
û çeng dikirin jiyana ku tu lê yî.
Salixên salixdaran digot
ku tu noqî gola çanda me ya gelêrî bûyî;
lê gotinên gotindaran ber guhan diketin
ku te di lîça felsefeyê de xwe şûştiye
û bûyî miya qer a nav keriyê sîs
ji ber gotegota der-cînaran.

Bawer ke, ji bo vê yekê
me rahişt hespên serbilind, xurt û narîn;
bawer ke, ji bo vê mebestê
hespên me ketin dilqê siwaran
çeng kirin, veneciniqîn û venekişîn ji xendeqan.
Her çi ku bozê min î rewan e,
bejna wî ya dirêj û kevankî
kej û katara stûyê qaçîkirî
û dêla wî ya çarparsî hûnayî
bûbû moçikê siwaran.
Şingeşinga nalên wî

defa sîngê min î fireh bêhtir dinepixand
û bişkokên qefesa kurtikê min difirandin;
ranên min li ser zînê çermîn
û gûzek li ser zengiyên hesinî
fenanî serçîqa serperaş a kevirkaniyekî direpiyan.

Dilê min bi hesta perîşanî û keserê
navê te vedişart li gencîneyan
û kilît li ser kilîtê dixistin.
Diranên min sûsa serfêza Warê Eysa dicûtin,
min bêriya zerdalî, alûç û sêvetirşkên baxçeyê kalikê xwe dikir;
lê hêjîrên baxçeyê bavê te li ser lêvên min diterixîn,
turincên welatê te jî
fenanî hingilên nûgihiştî girs dibûn
û dadiliqîn xewnên min.
Di vê kêşmekêşa mehşerkî de
dil û hinavên min ên hilkutayî
pênûsa destê serqefleyî şehitand
û navê te bû paroleya xweparastinê.

Min dev ji teralî û çenebaziyê berdaye dilsaxê;
lê devê xelqê ne doxîna mirovî ye ku bê şidandin,
her kes di tûşa xwe de tiştekî dibêje û dibilîne.
Lê bêgazindê,
roja dîdarê
te kirasekî nedirûtî li min kir,
ez derxistim şaneşînê
û malbata te
wekî benîzava bang li min kir.
Êdî mafê min e
ku jehra xezebê birijînim ser xêrnexwazan,
bi awayekî gefxur biqewêrim şeytên ji civatê,
zîvalzîvalî bikim wê kirêtiya bêqusûr
û bibim malxweyê jûra te.

Va ye tu qanî bûyî bi vê hincetê,
aş û baş bûyî bi vê derfetê
û êdî dikarim navê te binivîsim
li ser vê defterçeyê
Gulnîgar!

06.02.2023
Aksaray, Sitembol

**2. Ez û tu du cîhanên cuda ne**
Van rojan ez pê hesiyam
ku taybetiyeke me ya hevpar hebûye:
ez û tu du cîhanên cuda ne Gulnîgar
û hertim ji hev vediqetiyayî.
Her havînê
gava tu dihatî serdana malxalanan
em têr dibûn ji civîn û hevpeyvînê;

lê bervepayîzan
gava tu vedigeriyayî welatê xwe,
bi qasî maweya salekê
hevdîtin dibû dîlê kemînekê.

Van rojan tu jî pê hesiyayî
ku taybetiyeke min a wêjeyî hebûye:
li gorî xalbendiyekê radiweşînim peyv û hevokan
li ser kaxezeke bê zar û ziman
wekî ku fermandarê artêşeke taetkar
serbaz û leşkerên xwe
li gorî pergaleke rêkxistî
radipelikîne çalakî û tevgeran.

Niha helbestên min
wekî çemekî dengxurt dikişin zeryaya wêjeyê;
hêvîdar im ku her dareke turincê ya welatê te
hêviyekê bide ber dilê te ji bo pêşwaziyê
wekî ku welatê min veşartiye di bîra xwe de
her deng û wêneyekî me yî hevpar
her dem û gavên me yên cihêbûnê.

Tu bidî xatirê qehweyeke dukesî û razeke yekkesî!
Ma min negot ku ez û tu du cîhanên cuda ne?
Binêre li hêza tîpên alfabeyê
ez çawan welat bi welat gerandim
û carekê ez ajotim welatê te jî!
Binêre li hêza jimareyên bîrkariyê,
tu çawan kirî mamosteya min
di temenekî pir ciwan de!
Ez fermandarê tîpan
û tu hosteya jimareyan.
Êdî tu jî dizanî û pê hesiyayî,
gava ez û tu tên ba hev
û bi yekdengî biryarekê didin,
çawan pirsên jiyanê çareser dikin;
lê her yek ji me xwediyê qada xwe û pisporiyekê
lê her yek ji me xwediyê zimanekî cuda û neteweyekê.

17.02.2023
Aksaray, Sitembol

**3. Sal bihurîn, me hev nas nekir**
*“Giyanê bawermendî çivîkeke kesk e*
*ku li ser darên bihiştê diçêre.”*
Dizanim ku te ev hedîsa han nebihîstiye Gulnîgar.
Dîsa dizanim ku tu ne Um Kelsûma misirî nas dikî
ne jî ew strana wê ya bi navê *“Sibehê”*.
Her wiha baş dizanim ku tu qet nizanî
bê ka kîjan helbestvanî gotiye:
*“Bila dilê te li vî dilê pejmûrde bişewite*
*ku mîna çivîkeke ji refê qetiyayî difire te;*

*Dibe ku serê sibehekê ji serman biqefile*
*û bi awayekî hişkbûyî bikeve şaneşîna te.”*

Tu jî dibînî ku sal bihurîn
û me hev nas nekir;
tu jî dibînî ku temen pûç bû,
nexweşiyan tenduristî gerew girt,
têrkirina malbatekê pişta min xûz kir
û ezmûnên jiyanê
war bi war digerînin te.

Bêguman ne pêwist bû ku yek ji me bibêje:
*“Giyanê min çivîkek e*
*û niştiye ser dara te ya bihuştî.”*
Bêguman ne jî pêwist bû
ku em her du li kêleka hev rûnên
û strana Um Kelsûmê ji hev re bibêjin.

Bibexşîne ku nizanim te çi ji min dixwest,
te dixwest çi ji min bibihîsta;
lê bawer bike ku dixwazim bibêjim te:
*“Min pêşiyê navê te yê efsûnî bihîst;*
*paşê te bi zarê xwe vegot çîroka xwe,*
*bi zora zendên xwe deriyên girtî vekirin,*
*ji sifira li pişt jimareya nehê dest pê kir*
*û li jimareya yekê bêhn veda.*
*Çi bextewar im ku ez jî*
*geh wekî temaşevanekî*
*geh wekî hevaldersekî*
*geh wekî mêvanekî*
*û herî dawiyê jî wekî hevalqelemekî*
*ketim nava dîroka te bi serfirazî.”*

21.02.2023
Aksaray, Sitembol

**4. Sê kevirên jînberdanê**
Mêrê berê sond dixwar bi sê telaqên jinberdanê;
lê ez nikarim te berdim hey kurd, kurdî û Kurdistanê.

Bi rastî
ez dikarim hespekî hêşînboz î efsaneyî siwar bim,
derkevim derveyî Kurdistanê,
hespê min best û beyaran pêkol bike
û ez jî bibim nûnerê şûr û serbilinidiya gelê xwe.
Ez dikarim kirasekî teng î paletiyê li xwe bikim
di nava refên destengan de bibim rêhevalê biyaniyan,
guh bidim gazindên pîşekaran,
mijarên bêçare nîqaş bikim ligel birîndarên dilan,
çavên xwe ji şaşiyan birevînim
bi baldariya sofiyê li hemberî jineke nîvtazî,
birevim ji caxên zindanan û radarên dijminan,

bi kelek û babirkên bêhêviyan
û bi nihêniyeke tiptarî
xwe biavêjim hingilên penaberiyê.
Her wiha ez dikarim rûnêm ber Ferasetnameya Fexrê Raziyî,
ramanên sixtopixto û biryarên qilopilo biterikînim,
bi şîşeke sorkirî destê xwe dax bikim
ku careke din venegerim mey û piyaleyên destîsedef,
bi payîna berzexê
bihiştî û dojehiyan ji hev veqetînim,
û wekî nîşaneya hevxemiyê
hêsirên diltenikiyê birijînim ser êş û azarên bêpiştan.

Her wekî ku min got, ez dikarim gelek tiştan bikim;
her wekî ku mêrê berê sond dixwar bi sê telaqên jinberdanê,
ez jî dikarim dûr bikevim ji kurdan û Kurdistanê.
Lê belê teqez tiştekî nikarim bikim,
nikarim bi kurdî neaxivim û nehizirim.
Bi vê boynetê jî
ji jiyaneke bêyî zimanê kurdî re ne hazir im.
Bawer bike!
Heke biçime ber qeraxa deryayê,
ba li babirkan bikeve
û dilê min bi derbasbûna te binepixe jî
êşeke zirav li şehrega min digire,
qolincek dikeve nîveka her du kulangên min,
kulêmekên min sist dibin bi hejariya nexweşekî.
Ji ber ku baş dizanim hey rûqerqaşa çavbirqonek
merhebatiya te bi kurdî dest pê nake.
Tu jî qenc dizanî
ku çiqasî tengezar im ji tovê bîj
û nahêlim navê bîjayetiyê
li ser min û nifşa min bikeve.
Wisan e, hînî dewsa devê min be
her du lêvên xwe bike qerewil
û zimanê xwe berde esman û şkefta zimanê min.
Zimanê min bialêse keçê, zimanê min!
Bextewariya rasteqîn ev e,
bihêle, bila serzimanê te bitevize
bi tîrên rexneyî yên pêşîn.
Gazind û daxwazên xwe yên herî harane
aha di vê temtêlê de bibêje min.
Dev bi dev,
lêv bi lêv
û ziman li zimên aliyayî
biinte, binale û hespê kelecana min xar ke,
ji loqloqoyê derbasî orxe û çargaviyê ke.
Mînanî mûmyaya firewnekî,
mînanî wêne û peykerê zordestekî
req neke hest û hestiyên xwe Gulnîgar!
Veleze ber giyanê min î ku hemû rengan ber bi xwe dikêşe!
Bibeze ber tîna dilê min î ku hemû cendekê min pê dimeşe!
Ji bîr neke sê telaqên jinberdanê û sedeman!

Ji bîr neke sê kevirên jînberdanê û encaman!

*05.03.2023*
*Aksaray, Sitembol*

**45. Sedeqeyên helbestkî berî serdana Sîsilê**

**Sedeqeya yekem:** ***"şîva miriyan a êvara pêncşemê"***
Wî gelek tişt li dû hev rêz dikirin
û ji hevokan gewlaz dihûnandin;
lê ji wê rûniştinê sê hevok mane
di bîra min a tenîsk de.
Zanayê kurd bi şîretkî digote civata hazir:
"*Sûra rehmê kakilekî terr e ku di dilê dilsaxan de zîl vedide."*
*"Guhdariya xwedîmafan çêtir e ji ya gazindaran."*
*"Gava bala mîrekî vala dibe, gencîneya wî qulqulî dibe."*
Min ji van şîretan keşkûlek çêkir êvara pêncşemê,
zad berhev kir ji kolan, kuçe û deriyan;
berî dîdara Sîsilê
wekî şîva miriyan
belav kir li nava seriyan:
*"Raza cîhanê bi baldarî, guhdarî û dildariyê tê bidestxistin."*

**Sedeqeya duyem:** ***"kenê li rûyê hevalan jî sedeqeyek e"***
Fehmdarî ye ku niha li biyanistanê me,
lê li ser forsa xwe ya zarokatiya Kurdistanê me;
carinan rastî hevalên wan heyaman têm li aşxaneya dilkovanan,
bala xwe didim qerçûmekên rûyên wan
û serpêhatiyên wan ên jehrdadayî dixwînim.
Carinan pêrgî rêhevalên xortaniya xwe têm li gerîneka jiyanê,
temaşe dikim soberiya peyv û biwêjên wan ên cotwateyî,
lê têkoşîna me ya berê ya li hemberî dijminê hevbeş
nahêle ku vê pireya kevnare hanzûka birûxînim
piştî guherîna qibleyê ji Qudsê ber Mekeyê.
Piştre lêkenda kêfa hevdîtinê min dide ber xwe
û diajo meydana xatirxwestinê;
bi bawîşka devekî nîv-vekirî dikenim li rûyê wan,
ne îfadeya zarokane ya dilpakiyê dibînim li ser wan rûçikan
ne jî reng, hûrgilî û berateyên berxwadana me ya hevpar.

**Sedeqeya sêyem:** ***"destê çepê xêra destê rastê nebîne baştir e"***
Li gorî rayîşa civakê
destê rastê dirêjî merhebatiyan û xwarinê dibe;
her wiha xêran belav dike û hildigire.
Lê rebenê destê çepê
tu xêrekê ji destê rastê nabîne;
her çiqasî alîkarê roja reş be jî,
hemû karên qirêj û gemarî bişo, veşo û paqij bike jî.
Lewre ez jî edetî nasan
û li gorî vê rayîşa heyî
bi bismillahekê û bi destê xwe yê rastê
radihêjim çengek diravên hûrde û peritî,

wekî sedeqeyeke mirazxweziyê
kulma xwe vala dikim qutiya zarokeke mendîlfiroş;
hêvî heye ku bêgunehiya wê
pêpalekî xêrê derxe pêşiya min
roja hevdîtina Sîsilê.

**Sedeqeya çarem:** ***"xwenasî sedeqeya herî mezin e ku mirovî digihîne xwedênasiyê"***
Li ser xeta zirav a di navbera mirin û nemiriyê de dimeşim;
li aliyekî min kerwanserayeke vikvala li qûntara çiyayekî reqrût
li aliyê din labîrenteke şeytanî ya bêderî û bêpace
ku bi xeyal û wêneyên herî bêexlaq hatiye nixamtin.
Geh bayê azwerî û şehwetê dide rûyê min,
geh tevziyên hewesa xwenîşandanê dikevin canê min,
geh reklamên pûlperestiyê
bi kelbetanekî zengarî radipelikin ser hiş û dilê min.

Duh pisîkeke şîr-rijandî ez tirsandim
dema ku dadiketim naveroka ramanê;
ewqasî tirsiyam û îskiyam,
hindik mabû ku bi bêdengiya xwe ya dirêj bihesiyama.
Hêjayî gotinê ye ku bibêjim:
hêleke dilê min bi dilreqî bêdeng dimîne li gorî hevsaleyên min
û li gorî gotina bijîjkan
ev hêla bêdeng a dilî ji hezkirinê bêpar e.
Her çi ku hêla saxlem e,
bi kar û barên cîhana endaman re mijûl e,
dengeya sazûmana cendêk li wê derê keys dibe.

Îro êşeke nependî ketibû serê min,
lê dilê min wekî cîgirê serokî dixebitî,
her wiha tinazeyên xwe bi serê min î dûvdirêjkî dikir
û qewareya xwe ya gipgirover dipesinand.
Dilê ku guhdarî li tu endamê sazûmanê nedikir,
carekê gote sêrî:
*"tu qelp î û şelafiyan dikî;*
*ji ber ku serobero difikirî*
*û bi hewesên nepîvandî biryaran didî"*.

Niha berî nivistinê
piçekê baş im,
dilê min bi ser ket li hemberî serê min,
qîrevîra endaman a li hemberî bêpersiyariyê
hinekî nizm bûye
û dikarim plansaziya hevdîtinê bikim.
Bila şaş neyê fêmkirin,
ez û Sîsil
ji Qalûbelayê ve hev nas dikin;
rast e, li zeviya Kerbelayê
me hev û du winda kir,
lê ev nayê wê wateyê
ku me evîn û bêrîkirin kuta kiriye.

09.03.2023
Yenikapi, Sitembol

**46. De were, sipasiya Dilrûbarê neke!**
Min îro bihîst ku leglegeke gerok silav daye Gola Xelo,
carekê li ewrên gulokgulokî nihêriye
û carekê jî çav kuskusandine tîrêjên tavê.
Şahidekî nediyar gotiye ku vê benderuhê
bi kelecan û hêvî berê xwe daye Lîça Şeko,
bi kubarî û narînî li mêrgên qelenderiyan temaşe kiriye;
gava ew şivanê potkesk nedîtiye,
çivek daye baskên xwe bi teqlekî
îcar berê xwe daye Tehtê Lîça Hecî Beko
mînanî dûmana Tendûrekê bilind bilind firiyaye,
bi kubariya dildareke nûhatî perwaz daye
û li esmanê hephêşîn
vegeriyaye hilm û gilmekê,
êdî kesekî ne ew dîtiye ne jî bînaye.

Dilrûbarê, ew şivanê potkesk ez im,
diyar e ku ew qulinga ciwan jî
nevîçirçirka qulinga belek e,
dapîrka wê temeya min dayê berî mirinê.
Rebena Xwedê nizanibûye
ku xelaya mirovahiyê rabûye li gundê keleşkiyan,
mirov bi xwe bûne kurmik û ketine canên hev,
gundî bi xwe bûne kêzik û herikîne ziyanên hev,
eqreba li hev havî bûne
û ji bo totik û çîçik-vîçikan
gurkî girijîne qirikên hev.

Dilrûbarê, wan salan tu temenbiçûk bûyî,
dema ku ez ji gund derketim bi dizîka.
Wê çaxê
-ew çax here devê kulê û qe venegere-
lêpirsînên nihênî,
şikenceyên rûmetşikên
û bûyerên kuştinê diqewimîn.
Min xwe spartibû parzemîneke reştarî
û li wê tarawgeha neçariyê
wekî mêvanekî tawanbar dijiyam.
Min sond xwaribû,
ez ê nebûma goga ber çoganên sitemkaran,
min ê moçikên xwe yên bedew
raneçandana ser tevna kerxaneyeke bêperwa,
min ê nehişta tu jî bimelisî ser wê motikê
ku ji avikeke bîj şêliyabû.
Li wê biyanistanê
min dilê xwe veguhastibû mizgefteke heftminareyî
bi şeiyan re *“Nehculbelaxe”* mitale dikir û noqî diroka Ehlê Beytê dibûm
bi henefiyan re *“Fiqha Ekber”* dixwend û avceheke bêalkol fir dikir,
bi malikiyan re *“Miwete”* mizakere dikir, ava şêlî vedixwar û serê kûçikan mizdida

bi şafeiyan re *“Risale”* dişopand û fiqha medreseyên me yad dikir,
bi henbeliyan re *“Musned”* nîqaş dikir û ji serhişkiya selefiyan ibret werdigirt
bi ibadiyan re sedem û encamên şoreşên navxweyî gotebêj dikir
bi zahiriyan re çarçoveya giştî ya huqûqa îslamê raçav dikir
bi zeydiyên Yemenê re silav dida ruhê Îmam Zeyd û hemû serhildanên mafdar.

Hey şagirta min a ruhciwan, hey pîşeçaka tûmanpaqij!
Hey tekane hevala min a li girava bextewariyê!
Ez çendî çend rojan bûme masîgirê dozên beredayî,
çendî çend hefteyan bûme kûsîgirê sozên îhmalkirî,
çendî çend mehan geriyame bi hestên şermezarî û tawanbariyê;
lê piştî gelek meh û salan
nizanim tîra Xwedê bû ku li dilê min ket
yan zindîtiya dilê te yê xas bû ku rewneq dida mêjiyê min
yan tirs, heyranî û bayê evînê bû ku ez diajotim zomeya malbavanên te
yan dilşadiya evîndaran bû ku ez digiviştim li nava mengeneyekê.
Êdî her çawan hebe,
hest, huner û hedûra hosteyên vê sedsalê
ji bîra min çûn wê hingê;
êdî pêwistiya min bi zêr û zor û desthilatdariyê hebû
êdî pêdiviya min bi eşq û meşq û ciqnaqa Kaniya Herîreşkê hebû.
Lewre min wêneyê "Perwerdekarê Ķûsiyan" derxiste mezadê
û bi kar û kuspa wêneyî zivirîm taxa we
fenanî kûsiyekî temendirêj î bêhnkirêt.
Devîdevî taxê
li fêza Kevirê Qoşê
li bintara Bêndera Evdilahê Qelender
bîranînên koran û vegotinên lalan jî
firiyan ji bin kumê min,
ji ber ku êdî gul û sosinan rê nedida meşê;
dengên dengbêjan
li zagên serfêza gund olan dida,
galegalên civatgeran dixemilî, dikemilî, difetilî
bi dostaniya sermedî ya çarwerzî
bi hezkirina dualî ya zivistanî
bi pêşwaziya newrozî û bihara rengîn
bi kelegerma zindeweriya havînî
bi aramiya payîzî û amadebaşiya dijwariyan.

Ez ê tu carî ji bîr nekim wê pêşwaziya te ya germ
û wê gotina te ya zengilkî:
*“Were tewişiyo, bi wê bêhna xwe ya gulnêriyan!*
*Tu makê yekî mîna te neaniye rûkalê cîhanê!*
*Were tolazê heft welatan,*
*were devçepelê heft zimanan,*
*were,*
*mînanî şêrpenceyekê venişe ser gerdena min a sofî*
*û min bê ser û şûn ke*
*bê deng û berate ke*
*di bin wî potikê xwe yê qilêrî de.”*

*10.03.2023*
*Yenikapiya Sitembolê*

**47. Roja hevdîtina Qemerê, miçiqî kaniya kederê**

Berî hevdîtina Qemerê, gêrik digeriyan di mêjiyê min ê kunkunî de;
helbestê mizgîniya janên zirav dida dil û hinavên min ên kepazebûyî,
hêsirên jevdûrketinê digewimîn di çavên min ên ji girînan qerimî de,
kundekî xiniz jî dêlindêzeke perwerdehiyê durist dikir ji bo têjikên xwe
li meydana şerî ya terikandî
û li nava refên şervanan ên feramûşbûyî.

Ez li wî koxikê xwe yê hergavî vedileziyam bi bîbikên deliyayî
mînanî zarokê pêçekê yê nû mijandî
û bi xeweke sivik teliyayî;
Min nihêrî ku nehtika min xwih dide bi zîpikên veheliyayî
û zîbeqa germpîva daliqandî ligel salnameyeke xêra xwediyan
hilpekiye çil kêrtikî bi awayekî neasayî.
Min got qey argûna pixêriyê ji kevnebizotan agir hilkiriye
yan jî birîna înkê derkiriye
û heyf ji kêçan standiye
newêrekekî agirdadayî.

Min bihîst ku bû xijîniya xêliyeke tenik
û kete ser sîngê min destmaleke binefşî ya hênik;
min hanzûka tesele kir bi destpêlînkê bê ka xewnan dibînim
an jî bi xewnerojkên palebetalan xwe dixapînim.
Min pir dixwest
ku bi hawar û qêrînan vehundirim ser xwe;
lê devzendikê qutikekî narîn gihişte gepa min
û du tiliyan meqeskî gest kir hinarika min.

Min xwe şaş kir
û zivirîm ser aliyê xwe yê çepê,
lê bi rastî germahiyekê dida aliyê min ê rastê;
tîrêjên tavê yên turincî
ji pace, qelîştek û derabeyên firqmayî dibihurî
û ronahiyeke zêrîn diza hundir
wekî rexneyeke li gildîna sivderê.

Min cilik û palazên xwe arastin
ku bidime pey çavkaniya ronahiyê,
lê bi dîtina min re veciniqî
û ji nişkê ve hilbaskiya;
ew kundê marmij ê ku lûsiyabû ser minareyê,
li benda şevtariyê bû
û ji westana rojê vedihêsiya.
Bila wekî paşgotiniyekê neyê fêmkirin,
çend hevrikan lêv li min xwar kirin li kolanê;
lê teqez ewqasî ne girîng e rewş û reftara wan,
ji ber ku di bîra nifşan de nayê parastin
serpêhatiya segên gurî

ku tîna tavê ya sincirî wekî bedbextiya xwezayê dihesibînin.

Li devê newalê rastî wê hatim
-ew newala li bintara kaniyê,
a ku ava Şîpê Pişta Birek vediguhêze Çemê Noreşînê-
min çong veda ber bextê pênarînê;
Min xwe avêt pêşa tûmanê reşzemînî
gulgulî bi terza kirmaşanî,
gulên spî digel bistiyên ji keskê fistiqî xemilî,
bişkov bi sorê xwînê
û belçik bi qîçikê mirinê diçilvilî.

Dema ku min serê xwe bilind kir
û bersiva wê meraq dikir,
çavên min bi rûyê qemer ketin;
berî ku dilê min rehet bike bi *"erê"*yekê,
pêşiya pêşîn ew qêriya ser çavnebaran
û dengê wan birî,
piştre ez birim cihekî ewle bi çolbirî
û wekî min çong veda bi lavahiyekê:
*"Helbestvano,*
*hêza şûrê kurdano,*
*rengê xweşbîn ê serfiraziya wano*
*nîşana baldarî û meraqa wano,*
*dahênerê alavên serbestiya wano,*
*nîgarkêşê mebestên lawaniya wano,*
*sexbêrê çavkaniyên aramiya wano!*
*Erê!*
*Erê, heta mirinê!*
*Erê, ji bo watedarkirina jiyanê!*
*Erê, bi hesta qenciyeke xweş!*
*Erê, bi dilpakiya giyanên hevbeş!*
*Erê, bi mebesta berdewamiyeke geş!"*

Min bi destên xwe yên peritî ji xebatê
rahişte erzena ku tûk dadiqurtand ji ber kelecanê,
serê wê rakire qeysa lêvên xwe,
bi ramûsanekê çespand bilindiya eniya wê,
min girt zendedestên windabûyî li nava bazinên zêrîn ên badayî
û sparte qefesa xwe ew pêsîrgirsa bi salan tîmayî;
lê dadxwazê gazindên lêvan gihandin lêvan,
ji xwiha gerdenê delîl girt û qelpî rakirin,
ji jena sermemikan hêz girt û bişkok vereşandin,
gurpîna dil kir bihane û kiras çirandin,
di dawiya herî dawîn de
kaniya kederên min miçiqand wê Qemera keserkuj.

*14.03.2023*
*Yenikapiya Sitembolê*

**48. Helbesta heşt saetên vajîkirî ji xewê**
Divê bi duristî bibêjim

ku ji wan rojan tenê tu têyî bîra min;
wan çaxan gava tu dikeniyayî,
ji sersînga te kevok dipijiqîn esmanan bervejorkî
wekî ku berf û baran serberjêrkî dibarin erdekî reqitî yê hişkelokî.
Bi wî kenê te gul dibişkivîn li xasbaxçeyê dilê min,
pirçûnekên nexweşiyê û qerçûmekên pîrîtiyê winda dibûn li rûyê min,
tûncika min a çavtirsiyayî hanzûka diwestiya
û sîwanek -dibe ku çeperek- dida ber çavên min
da ku demeke dirêj bi temtêla devê te re mijûl nebim
û tevgera lêvên te şirove nekim.
Heke bi dilrastî bibêjim,
wan çaxan te jî bêbiryar li rûyê min ê rengdayî dinihêrî,
bi gavên giran dimeşiyayî ramanên min ên rengtarî,
bi keda gewriyên dengbêjan li hêsirên min ên dilşewat dihesiyayî,
û bi mirûzekî tirş li havîngeha dilê min dibûyî mêvan;
lê piştî xwarin û galegalê
ji bar û piştiyê evînê direviyayî
wekî berxikeke ji tirsa rawiran ziravqetiyayî.

Bi gumaneke eşkere
te hemû tişt kitkitî dizanibûn
û berî min
te cilik û pertalên xwe peritandibûn li ber tîna evînê;
dibe ku gelek caran
lêkend li çal û kortên çavên te rabûbûn
û tu bi anoreke şkestî ji şêwazê min ê çors veqetiyabûyî.
Niha siya te ya weşweşok
fenanî qijdeyê cinan dimilmile
li dîwarê dilê min ê teze bi bayê gerdûnê hesiyayî;
diyar e ku êdî tu bûyî dilbaz,
ne tenê dilbaz î
herwiha hunerbaz î jî.
Lewre bi kenekî pîvandî
terazûyê datînî ber henekbazî û çenebaziya min;
bi baldariya zêrfiroşan dinirxînî her gotin û tevgereke min
û te dil heye bikevî xewnên min jî
da ku bi qêrîna navê te veciniqim ji kawisan.

Duh şev
ango heşt saetên vajîkirî ji xewê
-tam heşt saetên çepwergerandî ji aramiyê-
te ez dame ber taveheyvê,
kincên min rizandin li ber ronahiyê;
ez wekî xwe reşqemilandim
di wî kuncikê dojehê yê xewle de,
bê pirsiyarî û bi renceke layiqî dilê xwe ez pijandim
wekî kaxetîtkeke qemirî li ber senca tava havînê.
Te ez vebijartim ji keriyê heyranan
wekî peza qurbanê ya bijartî;
diyar e ku tu
kêmasiya xwe bi heyraniya hosteyan dabîn nakî,
û dîsan bi min dikenî dîsan

bi kenekî veşartî ji çapemeniya boyaxkirî,
veşartî ji malperên şîfrekirî,
veşartî ji teniya donê xinzîrî.

Gava dihizirim
li ser wan guldankên wergeriyayî
û li ser wan qutiyên diyariyan ên gêrbûyî,
tavilê tên bîra min:
serên qûçkirî yên li pêşiya cengawerên zirxkirî
û dîlên tax bi tax gerandî ji bo firotanê
bûyerên heyamek ji heyamên dîroka dûrî texmînên piştrastkirî.
Lewre dibêjime xwe:
*“Xwedê çima derfeta naskirina min daye vê kesûkê,*
*lê nikare bextewar bibe li ser bingehê beranberiyê?”*
Piştre poşman dibim ji vê pirsa xwe
û bi mikurhatina korê nebîna sûcdar dibînim xwe:
*“Omito, semaxkurto!*
*Riya kamraniyê bizanibî jî,*
*tu nikarî bigihêjî asta wê kesûkê ya tomarkirî*
*li arîgên kilskirî yên xanî û nexweşxaneyan!*
*Wê canikê çi şetele derbas nekirin*
*ji bo vegerandina te li werza bengîtiyê;*
*êdî tu neçar î*
*ku bidî ser rêça wê ya tijî keser û şepirzetî.*
*Hayedar bî ku xwedîbext î jî,*
*ji ber ku wê riya te bi destopiçko û pencirûkan sererast kir;*
*lê niha bûye rênasa te*
*û bi guhên mûrçkirî li ihtimalan*
*te çemê teral ê li besta tehtevêlkî*
*bi kurtebirî diherikîna zeryaya xwe ya kerr û lal.*
*Sipasiya bendeyên heqkirî*
*hesîbanî îqrara şukranê ye ji bo Xwedê.”*

17.03.2023
Yenikapiya Sitembolê

**49. Li ser şopa Aryayê**
Rojeke xortaniyê ya geş gava gihiştim serfêza Bazirganê
Pez vekişiyabû guheran, dewar civiyabû li gera mozirganê

Te digot ku Ristemê Zalî dêw û şeytan berk girêdane li wir
Esmanê çiksayî jî şîna Ehlê Beytê digire bi bangeke azanê

Rêhevalan got ku werin dakevin naverasta bajêr bi pirsan
Bersivê wergirin ji ajovanên ku averê dibin ser Hegmetanê

Min qîma xwe bi pêşniyarê neanî, kêliyekê li mijarê ponijîm
Bi dilê xwe min dît ku leylana Aryayê diçirûse li Xoresanê

Min nihêrî ku Adirbadegan bûye tewleya nijadên moxolî
Nav û nîşaneyên aryayiyan guhastine bi domana dewranê

Xûzistan bûye milkê ereban û Belûçistan jî parparî bûye
Amûderya û Serîderyayê Yezdogird gazî dikire vê leylanê

Min got ku *“qasekê rawestin, ramanên xwe ezmûn bikin*
*Bi encaman dîroka dotmam Aryayê vebêjin li Kurdistanê”*

Min berê xwe da Deşta Makûyê, qêriyam bi helbestekê:
*“Aryacan, çîroka min a dilşewat bibihîze bi eşq û kelecanê!*

*Dotmamê, binêre, penc vedane tîrêjên spêdeya zanistê*
*Lê dezgeyên pîşdadiyan vegeriyane kelefeyan li Aranê*

*Min ewqasî ji te hez kir ku navê te danî ser milk û waran*
*Ez wekî dildar û parêzerê te nas kirim hemû mîrên cîhanê*

*Dema ku bapîrê me Key Xusrewî Efrasyab diqewirand*
*Min û te gotina xwe kiribû yek, te yê şû bikira bi dîlanê*

*Lê Hexamendişî bextewariya me pesend nekir bi kîndarî*
*Loma ez vekişiyam Çiyayê Agiriyê ji bo şêwra malbavanê*

*Min ê kebîna me girêda li ba muxan, bi destûra melayan*
*Lê Skenderî êriş anî ser zomeya me, te xwe spart Eşkanê*

*Gava Mîr Begdad damezirand bajarê Bexdayê bi serfirazî*
*Ligel kelekvanên çemê Ferêt hatim ji bo dîdar û serdanê*

*Lê Erdeşîrî kelek serobino kirin, berî ku bigihêm Dijleyê*
*Loma ez vekişiyam nav romî û ereban ji bona serhildanê*

*Ji ber ku min şûrekî tiptûj girêdabû li nava erebên rihpalik*
*Wan peymana Kadeşê çirandin bi êrişa Qadisiyeyê ya hanê*

*Min dîsan xwe sparte çiyayan heta mîrekiya Ebû Mislimî*
*Digel bermekiyan daketim çolistana Îrecî ji bo tolhildanê*

*Lê hêzên nihênî yên tarîbanê pêşîbir danîn ber dîdara me*
*Lewre hevdîtina me egle bû heta êrişa tirkên Moxolistanê*

*Kurdên celalî nepejirand riswatî û hespên moxoliyan dizîn*
*Loma navê me wekî hespdizan hate tomarkirin li paşxanê*

*Rast e, nevîçirkên Pîrozşahê Kurd em gihandin hev carekê*
*Di bin sîwana Sefewiyan de me rizgar kir beşeke Aryanê*

*Lê heta roja îroyîn jî em derneketine asta Kûrûşê Mezin*
*Her yekî me li ser mezheb û ayînekê dimeşîne berxwedanê*

*Bîne bîra xwe, çawa agir ji firnikên hespê Daryûşî difûriya*
*Derdên badekbadekî radibûn li dijminan ji ber bacdanê*

*Me qasidên xerabiyê serberjêr dikirin bi hemahengiya xwe*

*Heta ku tovên çelexwarî reşandin navbera me li Çildêranê*

*Me soz dabû hev, me yê li Qesra Şîrînê govend bigeranda*
*Lê xêrnexwazan şahiya me feşkiland bi fend û hevfirotanê*

*Aryacan, tu bidî xatirê Mesûmeya Qûmê û Îmamê Meşhedê*
*Pismamkujiyê rawestîne, nehêle devê Iblîsî bigirnije bi kenê"*

Dengê min olan da li nava zag û zinarên hawirdora Makûyê
Êdî nizanim çawa vegeriya hêwirzeyekê li bakurê Mukriyanê

Gaziya min fenanî bîranîneke bextewar a li devereke pir dûr
Ji kaş û kerîşan derbas bû û dîsa zivirî ser cîderka wê olanê

Li hêwanên tarî çirûskan pêt û rivîn girtin, her kes pê hesiya
Li nava dertengên bajêr girseyan xwendin sirûdên xêrhatinanê

Te digot ku vejîna miriyan e vê nîvroyê, loma ev hesta kûr
Mîna xirexira sîngan û kuxika ji pişikê tê bihîstin li meydanê

Li ser riya xwe ya dirêj rastî kurmam Nejdetê Cindî hatim
Pirsî bê ka diçim kê derê, min got: *"Diçim Tewrêz û Zencanê*

*Min kîsikê bazirganekî kiriye berîka xwe, lê birastî gerok im*
*Ez ê ji cinên xemgîniyê veqetim, bişopînim bextewariya jiyanê*

*Ez ê qul bi qul bigerim li warên ku şûnpêyên yarê hîn lê hene*
*Li gencîneyên winda yên pêkvejiyanê bigerim digel wê dilovanê*

*Bawer im, ew ji min pisportir e, berî min ji delavan re bihuriye*
*Ew ê xwe li deng û olanê bigire, derkeve pêşwaziyê li Têranê*

*Ez lêgerînerê bênexşe me, bêzarî û bêhiziriya evînê min diajo*
*Ew qenc û gunehkarî ji hev cihê dike, dê min nas ke ji dûriyanê"*

Kurmamî destê xwe li pişta min xist, silametiya rûgehê xwest
Hilm li ser hilmê vedidan, çav diqerimandin bi hêvî-bendemanê

Ez wekî qelema zil a ku li huqeyê digere daketim deşta fireh
Bi riya Tewrêz û Zenganê gihiştim Têranê ji bo hevdîtinanê

Li ser şîreta kek Xelîlê Qulixanî bûm mêvanê Îsmayîlê Entabî
Bi rênimaya wî min nas kir pergala heyî, piştre çûm Qûmistanê

Li Qûmê bûm mêvanê xwendekar û bazirganên kurd demekê
Piştre ji bo lêkolîneke kurt derbas bûm kevnebajarê Espehanê

Li wir çûm serdana zanîngeha wê û geriyam li Polê Sî û Sê
Vehêsiyam li Mêvanxaneya Kawayî û derbas bûm Bacgîranê

Di vegerê de bûm mêvanê hêwana Îmam Reza eleyhiselamî
Rijandin hêsirên hezkirinê, bi ser Têranê re zivirîm Kirmaşanê

Min dixwest bi ser Qesra Şîrînê re biçim serdana Kûfe û Necefê
Lê serbazên Sedamî destûr neda, negihiştim mirazê wê serdanê

Êdî min biryar dabû, ez ê vegeriyama welatê xwe bêyî Aryayê
Lê belê hatim agehdarkirin li Xuremavayê bi destî qerwaş Şamanê

Wê qerwaşa tirkîziman gote min ku *“yara te derketiye zozanan*
*Ji vê germistanê tengezar bûye, ji bo betlaneyê çûye Nexciwanê”*

Lewre bi ser Tewrêzê re derketim Nexciwanê, li rêça te geriyam
Mixabin li wir jî min tu nedîtî, bi xemgînî vegeriyam bajarê Wanê
Ax Aryacan, ez çiqasî li te geriyam li nava wêraneyên pîşdadiyan
Çiqasî zariyam, dema ku kişwera me tarovaro kir Efrasyabê Tûranê

Ax Aryacan, ez çiqasî kêfxweş bûm bi serbilindiya me ya hevpar
Bi çi kelecanê reviyam pêşwaziya artêşên serkeftî yên Medistanê

Ax Aryacan, çiqasî derdomerdo bûm bi têkçûna me ya lehnetî
Roja ku Skenderê Kodeman hesp ajotin ser serayên Hexamenê

Ax Aryacan, çi hêviyan zîl veda li ser sîngê min ê rût ji poşmaniyê
Serdema ku hozên me li ser kevneşopiya pêşiyan kom bûn li Eşkanê

Ax Aryacan, çiqas xwîn kişiya di navbera malbavanên me de
Roja ku rikeberiya li ser têxt paytextê welêt kaş kir Teysefanê

Ax Aryacan ax, ez ê qala têkçûnên me yên dîtir nekim, bes e
Tu bidî xatirê îmamên Ehlê Beytê, neaxivîne birîna jevdûrmanê

Lap çil sal in ku li te digerim, ziman û dîroka te zindî dikim
Qe nebe tu jî çar salan terxan bike ji bo berginda pêkvejiyanê

*Destpêk: 12.03.2023, 22:52, Yenikapiya Sitembolê*
*Kutahî: 26.03.2023, 00: 42, Bazîd*

**50. Trajedyaya îlahî**
Ez Omitê Mistefê,
ji gundê Noreşînê,
niştecihê Bazîdê,
niha li Meletiyê mêvan
û pêncî salî.
Dê û bavên min
bêyî rizamendiya min zewicîn,
ez li pey xwe hiştim û çûn
wekî zarokê pêncan ê zindîmayî;
di vê navberê de
çend xwişk û birayên min jî
hê di pêçekê de mirin bê ser û şûn.

Li wî gundî herrikîm û terrikîm,
bi xwezayî hînî kurdî bûm

di nava malbatê û civatên gundiyan de.
Di şeş saletiya xwe de çûme dibistana seretayî,
ango bi dilêrî ketim navbera her du beraşên aşê romiyan;
bi zimanekî biyanî hatim perwerdekirin
li ser derewên danisqe
û veqetîm ji xeyalên patisqe.

Sala ku ez ê biçûma Bazîdê
ji bo xwendina dibistana navîn,
mal hilgeriyan zozana me ya Şêresiyarê.
Apê min ê Elî keriyek kavirên nêr girtibû
û dixwest digel pismamên xwe derkeve çêregeha hevpar;
lê gundî engirîn û bi çavnebarî li aranê man.
Roja pêşîn a ku em gihiştin gera waran
ez î berxvanê bavê xwe bûm
û sipasî ji bo wî ku tu carî
em ji xelqê re nekirin şivan û gavan.
Aha ew roja pêşîn a ku em gihiştin gera waran
rojeke bêmiraz bû ji bo min,
ji ber ku dergehê hesinî yê radara romiyan
bi ser lingê min ê çepê de ket.
Bi rastî ez û Hesê Îsmayîlê Ûsê
di paceyên vekirî re ketibûn avahiya vala
piştre ez derketibûm û hatibûm ber dêrî;
lê Hesê darikên li dora perwazê dergehî kişandibûn
û bi pehînên minexetiyê ew wergerandibû ser min.
Derî tenê ji panî û gûzekê girtibû;
pa û pesn ji Xwedê re
ku bi birîneke sivik û bêşkestek filitîm.
Birîn sivik be jî, pakbûnê dirêj kişand;
li Bazîdê bi qasî sê mehan hatim dermankirin
û li mala Biroyê Emê Sosê mam bi mêvanî.

Min nizanibû ez ê rojekê bibim niştecihê vê taxê,
li kêleka mala Biroyî piyên xwe hene bikim
û rawestim bi zewac, bavtî û malxwetiyê;
rojek ji rojan bi ser derd û kulên xwe de bihênijim
ji nifşên peyhatî re serpêhatiya xwe ya dilsoj vebêjim
û li ser vê trajediya îlahî rondikan birêjim.

Min nizanibû,
alfabeya aramî ya ku li mizgefta Noreşînê pê re bûbûm hevnas,
dê min biçerxîne li çolistanên ereban tî, birçî û pêxas;
min nizanibû,
alfabeya latînî ya ku li dibistana vî gundî hîn bûmê
dê min kaşî Stenbolê bike
û ji wir bifirîne Almatiya Asyaya Navîn.
Her wiha min nizanibû,
alfabeya kîrîlî ya ku bi serî xwe fêr bûmê li Bazîdê,
dê min hilkişîne Moskovayê
û dagerîne li Ukrayna û Bulgaristanê.

Îro dixwazim
tenê bi kurdî bixwînim, binivîsînim û biaxivim;
lê şeş-heft ziman bi hev re dikumişin ser serê min,
nahêlin xwe rasteve bikim
ji bo şûştina şopên biyaniyan.
Îcar min di sernavê de jî got:
derdê min trajediyeke îlahî ye,
ez dikarim bibim her kes bi nasnameyê;
lê nikarim vegerim ser koka xwe bi fermiyeta mîrnameyê.

*14.10.2022-26.03.2023*
*Meletî, Tekirdag, Sitembol, Bazîd.*

**51. Bi xatirê te Bazîda rengîn heta vegereke din**
Vê sibehê rêwî me dîsan,
ji Bazîda rengîn diçime dûr û dereziyan;
nizanim dê bi karê vegerim bêziyan
an jî bi ziyankirina mirazên dijminan
vegerim nava xwarzî û biraziyan.

Bi xatirê te Bazîda rengîn,
bi xatirê te heta vegereke din!
Tu jî dizanî,
tu bajar nikare min biêwirîne mîna te,
tu çiya nikare min bihêvojîne mîna Aryaradê,
tu av nikare tîbûna min bişkîne mîna ava Kanîspiyê,
tu erd nikare xwe ragire li ber piyên min
dema ku doza welêt dineqişînim ser helbest û pexşanê,
tu hewa nikare neksa min fireh bike
dema ku xwe berdidim nava sîng û berên suriştê
û tu agir nikare min germ bike roja newrozê
dema ku hevrê direvin totikên li ser goristanan belavkirî
bê eyd û erefat
bê şerm û şerefat.

Ez ê vegerim te Bazîdê, xemê nexwe;
lê li niştecihên xwe gefê bixwe
ku zimanê me yê resen nefroşin
bi berginda protezên biyaniyan,
ku mizgefta me ya kevneşopî
vala nekin ji bo xatirê şamaniyan,
ku meydana me ya lîstikan
nehêlin ji bo perwerdehiya piştcehşikan
wan barkêşên rûreşiyan.

*26.03.2023*
*Bazîd.*